# ÇAND Û SINC

# NAVÎN

# 3

2019/2020

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Çand û Sincê ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**- Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


## BEŞA YEKEM: ÇAND Û SINCÊ GELAN ....................................... 7

ÇAND Û SINCÊ KURDAN................................................................ 8

ÇAND Û SINCÊ SIRYANAN ........................................................... 11

ÇAND Û SINCÊ EREBAN ............................................................... 14

ÇAND Û SINCÊ ERMENAN............................................................. 16

## BEŞA DUYEM: TÊKILIYÊN ÇAND Û SINCÊ............................. 19

ENCAMÊN KU ÇAND DERDIXE HOLÊ............................................ 20

DI ÇANDÊ DE HUNER.................................................................... 24

CIVAKBÛN Û SINC ........................................................................ 27

DI CIVAKÊ DE RISTA SINCÊ......................................................... 30

TÊKILIYA SINCÎ BI BAWERIYÊ RE.............................................. 33

SINCÊ AZADIYÊ ............................................................................. 35

## BEŞA SÊYEM: DI DÎROKÊ DE ÇAND Û SINC.......................... 39

DI DEMA PALEOLÎTÎKÊ DE ÇAND Û SINC ................................. 40

DI DEMA PALEOLÎTÎK DE ŞÊWAZÊ JIYAN, ÇAND Û SINCÊ CIVAKÎ ....... 42

DI DEMA NEOLÎTÎKÊ DE ÇAND Û SINC...................................... 45

AVABÛNA PERGALA JIN-DAYÎKÊ ............................................... 48

ÇAND Û SINC DI ÇÎNAYETIYÊ DE................................................. 51

ÇAND Û SINC DI DEWLETÊ DE .................................................... 56

## BEŞA ÇAREM: DI CIVAKA KURDAN DE ÇAND Û SINC....... 61

ÊL Û SINCÊ KURDAN.................................................................... 62

ZERDEŞTÎ Û SINCÊ AZADIYÊ ..................................................... 64

ÇANDA Û SINCÊ EZDAYETIYÊ .................................................... 68

ELEWÎTÎ Û ÇANDA KURDAN A BERXWEDÊR............................. 74

DI QONAXA ÎSLAMIYETÊ DE REWŞA BAWERÎ Û ÇANDA ELEWÎTIYÊ .. 77

PÊVAJOYÊN PIŞAFTINA ÇANDÎ .................................................. 80

DI PERGALA KAPÎTALÎZMÊ DE PIŞAFTIN .................................. 83

ÇANDA BERXWEDAN Û XIYANETÊ............................................. 87

# BEŞA YEKEM: ÇAND Û SINCÊ GELAN

- **ÇAND Û SINCÊ KURDAN**
- **ÇAND Û SINCÊ SIRYANAN**
- **ÇAND Û SINCÊ EREBAN**
- **ÇAND Û SINCÊ ERMENAN**

**Wane 1**

# ÇAND Û SINCÊ KURDAN

Her gelê ku li cîhanê dijî, xwe bi rêya çand û sincê, xwe pênase dike. Gelê kurd jî, yek ji gelên cîhanê ên ku xwe bi dewlemendî û berdewamiya çand û sincê xwe daye nasîn û berdewamkirin.



Çanda Til Helef

Kurd bi koka xwe yek ji gelên çanda aryen e û axa Mezopotamiya û Rojhilata Navîn cihê belavbûna vê çandê ye.

Kurd, ji aliyê koka xwe ve, gelê herî kevnar e ji ber çiya, çandinî û lawirvanî bi kurdan re yeksan in. Ji ber wê jî civaka kurd biwatekirin hêsantir e. Çanda bajarvaniyê, têgeheke ku ji kurdan dûr e, lê gundîtî di dîrokê de yek ji pêngavên ku ji aliyê civakî ve herî kevnar e, ku ji aliyê bav û kalên kurdan ve hatiye destpêkirin.

Kurd, bi qasî ku gundî û koçber in, ew qasî jî, ji bajarvaniyê dûr in. Weke civakeke pir vekirî, eşkere ye ku nîv gundîtî û koçerî şêweyek ji yên cîwarbûn û jiyana kurdan a bi hezarê salan hatiye berdewamkirin e.


Bajar bi piranî, ji aliyê dagirkeran ve hatine sazkirin û tijîkirin. Ev, nayê wê wateyê ku kurdan tu caran bajar saz nekirine û nebûne xwediyê şaristaniyê.

Tê zanîn ku di destpêkê de konfedrasyon û dewletên Mîtanî, Urartu, Med, Merwanî û gelek şaristaniyên bajaran ji aliyê kurdan ve hatine damezirandin.

Di serdema navîn de hikumetên bajar û eyaletan hatine damezirandin, lê ji ber ku nebûne dewlet û hikumetên demdirêj, bajarvaniya wan jî demkurt bû. Bajar, zêdetir bûne navendên dagirkeran û civakên derdorê pêk anîne.

Gelek nivîskar, rewşenbîr, rêveber û fermandaran di ziman û çanda cîranan de rist lîstine. Her çi qas kurd xwedî kokeke kevn û bingehekî çandî ne, di rewşeke zimanê bê sînor ê nivîskî de mane û nehatine rewşa zimanê dewletê. Tevî vê çanda kurdî, di rêyên cuda û zehmet de jî hebûna xwe ya etnîkî û bermahiyên xwe anîne ta roja me ya îro û hîn jî diparêzin.
Çand û zimanê kurdî li gorî gelek arkeologan li çiyayên Toros û Zagrosê, weke ziman û çand Şoreşa Neolîtîkê a destpêkê daye destpêkirin û bi demê re bûye bingehê çand û zimanê arî.
Tê texmînkirin ku piştî dawiya dema qeşayê (20000-15000) sal B.Z weke çand û zimanê herêmî şêwe girtiye. Etnîsîteya kurdî, di salên 6000 B.Z de pir baş diyar dibe, pêşiyên kurdan, Neolîtîkê sazûman dikin û çanda Til Helef ava dikin û di rewşa berdewamiya wan civakan de ne.

Hûrî cara yekem, di 6000 B.Z de derketine ser dika dîrokê. Peyva Hûrî jî, tê wateya xelkên "welatê bilind". Ango dîsa bi wateya "Gelê çiyê" ye.


Mezinê Gûtiyan

Gûtî, mîtanî û kasîtan di deng û bingehên cuda de weke civakên ku dişibin wan, ziman û çandeke hevbeş parve dikirin. Çanda civakî ya kurdan ji yekîne û komên cihwarbûnê dest pê dike û bi vî awayî dibin xwediyê nasnameyê.

Çanda gund û çandiniyê di dîrokê de çanda civakî ya herî kevn e. Cîhana me ya îro jî, di rêjeyeke mezin de li ser çanda gund û çandiniyê hebûna xwe diparêze. Taybetiyên vê çanda civakî ya herî girîng, di bingehê komên biçûk de, di nava hev de jiyîn û bi qasî ku têra wan bike, erdê bi kar tînin û ji bo jiyana xwe dest bi çandiniyê dikin.

Her wiha, debara xwe bi çandiniyê dikin. Ango jiyaneke niştecih e. Lewra ji şoreşa destpêkê ya herêmê re, **şoreşa çandiniyê** tê gotin. Di heman demê de jî, ew komên bi girêdana xwînê xwedî rêxistineke êlî û li ser nasnameyên etnîsîteyê nasnameyeke nû ya civakî ye, rê li ber teqîneke girîng vedike û pêşketinên girîng pêk tîne.

Kurd tevahî, bi vî awayî jiyane. Jiyana xwecihî di pêkhatina êl, gund û çandiniyê ya kurdan de, ji bo civakîbûnê risteke sereke lîstiye.



Îro civaka kurd, hîn jî şopên jiyana kevn, ango jiyana xwezayî di nava xwe de digire. Jiyana di gund de, hîna taybetiyên xwe diparêze. Çanda jiyanê, hîn berdewam dike. Ger taybetiyên civaka komînal, hîn jî di nava xwe de diparêze, ev ne ji ber ku hîn sermiyandariya modernîteyê neketiye nav lê ji ber ev yek ji xwezaya civaka kurd e.

Di civaka kurd de, di navbera komînalîzmê û modernîteyê de her çi qas bi sedê salan têkoşînê berdewam kiribe jî, di civakên din de sermiyandariyê şêweyê komînalîzmê derbas kiriye û li paş xwe hiştiye, lê di civaka kurdan de qet nikare vê derbas bike.

## Pirsên Nirxandinê

1- Kurd ji aliyê koka xwe ve, bi çi re yeksan in?
2- Têkiliya kurdan a bi gund û bajaran re, şîrove bikin.
3- Wateya peyva Hûrî çi ye ? Hûrî kengî derketine ser dika dîrokê?
4- Îro civaka kurd, şopên kîjan jiyanê di nava xwe de digire?

**Wane 2**

# ÇAND Û SINCÊ SIRYANAN

Siryan di koka xwe de, samîtîk in. Çanda samîtîk ya ku aramî, asûrî û kenaniyan di nava xwe de dihewîne.

Li gorî texmînan 8000 sal B.Z ev gel ji Erebistanê ber bi Mezopotamiyayê ve hilkişiyane, her gelek ji van gelan xwe li erdîngariyekê bi cih kiriye.



aramî û kenaniyan li başûr û rojavayê Kevana Zêrîn xwe bi cih kirine û ekadî û asûriyan xwe li Mezopotamiya Jêrîn bi cih kirine.

Siryan jî koka xwe ji van digirin û çanda xwe li Rojhilata Navîn bi pêş dixin, ev yek jî dibe sedem ku bi demê re bibe desthilat û çînayetiyê ava bike. Lê sîstemên ku hatin avakirin dixwestin vê çandê di nava xwe de winda bikin.

Hewildanên pişaftina çand, dîrok û hebûna siryayan pir bûn, lê bi şoreşa gelan li bakûr û rojhilatê Sûriyeyê re careke din derfet li lêvegera çandan vekir.

Tevahî çandên heyî li kevneşopî, xweşikbûn, ziman û çanda xwe xwedîderketin û komeleya çandî ya siryanan encama vê şoreşê bû.

Dewletnetew ya ku di nîvê sedsala 19'an de hat avakirin her tim hewil dide ku van gelan di nava xwe de bipişêve, winda bike, pê re pir rengiya çandî bikuje û çanda desthilatdariyê di nava gelan de bide pejirandin.

## Wêjeya gelêrî:

Li gorî lêkolînvanan heya roja me ya îro jî gelek mayînên asûrî û sumeran di nav filiklor û bermahiyên siryanî de mane. Bi taybet, stran, awaz, dîlanên gelêrî û gotinên pêşiyan . Ev filiklor ji nifşekî derbasî nifşê din dibe.

Wêjeya siryanî, bi wêjeya Mezopotamiyayê re bandor bûbû û bi taybet di hunera afsaneyî û peyvînê de, ev yek jî di cejnên gulanê de diyar dibe, piştre ev cejin derbasî xiristiyantiyê bûn.

Roja despêka biharê li cem siryanan bi navê (Zag – mûk) dihat nasîn; bi demê re têgeh hat guhertin û bû (rojiya mezin).

Siriyaniyan di teolojiya ola xiristiyanî de roleke sereke lîstine.

## Cejna Ekîto:

Di çanda siryanî de, cejna Ekîto ji cejnên kevn yên dîrokê ye, ji 3000-2000 B.Z berdewam kiriye.

Ekîto peyveke asûrî ye, tê wateya hebûn, tevî ku piraniya gelê siryan bûbûn xiristiyanî jî, lê vê cejnê her ku diçû berdewam dikir.

## Zimanê Siryanî:

Zimanê sirryanî bi koka xwe vedigere akadan, yê ku di demeke dîrokî de weke zimanê fermî yê Mezopotamiyayê dihat nasîn.

Zimanê siryanî zimanekî zindî ye, ji ber bingehekî wê yê xurt bi hezarê salan heye.

Vî zimanî girîngiyeke olî di xiristiyantiyê de dîtibû ji ber nivîsa gelek pirtûkên ola xiristiyanî û di islamê de jî rola wergerandina felsefîk lîstibû. Girîngiya zimanê siryanî hiştibû ku pir dibistan û zanayan biafirîne.

## Nirx û Sincê Siryanî:

Siryanan bingeh û rêgezê bajarvaniya nû ava kirine berî 4000 B.Z pê re rêxistina jiyanî û sîstemeke sincî ya bi nav û deng li Rojhilata Navîn belav kirine.

## Zanayên Siryanî:

### Ehîqarê Zana:

Zanayekî di sedsala 7`an de B.Z jiyaye, şêwervan û wezîrê paşa Senherîb bû. Ehîqarê zana bi sincê jiyanê mijûl dibû û jiyana afrîner û sincî di nava gel de belav dikir. Gotin û mînakên wî li seranserî Mezopotamiyayê belav bûbûn; bi navê Luqman gihaştibû ereban û bi navê Îsofos gihaştibû Yûnanan.

## Afrahat:

Weke zanayekî pers tê nasîn, lê ew bi xwe rahib û nivîskarekî siryanî ye. Ew bûbû xiristiyanî; navê xwe guhartibû û kiribû Yaqûb, lewma bi şaşî pir nivîsên wî bi navê yaqûbê rêveberê dibistana Nisêbînê hatine belav kirin.

## Pirsên Nirxandinê

1- Bandora siryanan di avakirin û pêşxistia çanda Rojhilata Navîn de, lêkolîn bikin.
2- Rola siryanan di şoreşa gelan de diyar bikin.

**Wane 3**

# ÇAND Û SINCÊ EREBAN

Çanda erebî koka xwe ji Rojhilata Navîn digire û rêbazê jiyanê bi awayê zanabûn, peyvîn û helbestan diyar dike; ev yek dibe neynika hizir û afrîneriya vê çandê.



Çanda ereb weke hemû çandên din di gelek qonax û pişaftinan re derbas bûye, vê yekê jî bandoreke pir mezin li ziman, çand, sinc, huner û hizra ereban kiriye.

Têkiliyên çanda erebî bi şaristanî û bajarvaniyê re pir xurt in, lê bandora sermayedariyê li gelên cîhanê ev çand teng û lasayî kiriye û ji cewherê wê dûr xistiye.

Her wiha zimanê erebî jî piranî bi herêmî hatiye belavkirin û sîstemên birêvebirina civakan jî ev çand li paş hiştiye û pir ziyan gihandiyê.

Vê çandê xwe li ser lawirvanî û koçeriyê berdewam kiriye û guherîna herî mezin bi hatina islamê çêbûye. Islama ku bi zimanê erebî xwe nîşan dide, çanda erebî bi rêya islamê û wergerandinê pir tişt qezenc kirine, wêje, huner, felsefe, lojîk (mentiq) û hwd û di bin sîwana islamê de zimanê erebî li seranserî cîhanê belav bûye. Ev yek jî hem bi erênî li

zimanê erebî vedigere ku wî bêhtir dewlemend dike û hem jî bi neynî lê vedigere ku zimanê herêmî çêdike û pir gotinên biyanî di nava xwe de dihewîne.

Dewletên ku ereb tê de dijîn derfetên jiyanê tê de lawaz bûne, ji ber desthilatdarên ku birêveberiyê dikin, tenê ji bo berjewendiyên xwe yên kesayetî dixebitin. Vê yekê jî hiştiye ku çand û sincê ereban bi destên van desthilatdaran winda bibe.

### Taybetiyên Sincî yên Civaka Ereb:



1- Comerdî: Ereb bi comerdiya xwe bi nav û deng in û ev yek jî di gelek çîrokan de hatiye gotin.
2- Mêrxasî: Bi mêrxasiya xwe hev diparêzin û pişta xwe nadin hev.
3- Reseniya ziman û peyvînê: Li bazar û meclisên hunerî helbest û peyvînê di nava xwe de pêşbirk çêdirikin.
4- Rastî (Zelalbûn): Ereban di dîroka xwe de hewl didan her tim rast bin û navê wan bi derewan belav nebe.
5- Piştevanî: Bi piştevaniya xwe li kêleka kesê ku her tim mafê wî tê xwarin disekinin.

## Pirsên Nirxandinê

1- Taybetiyên çanda ereban lêkolîn bikin.
2- Bandora sermayedariyê li ziman û çanda erebî binirxînin.

Wane 4

# ÇAND Û SINCÊ ERMENAN

Ermen bi koka xwe aryen in, tevî gelek gelan li Rojhilata Navîn jiyane . Ji Asya ber bi Ewrupa ve koçber bûne, piştre zivirîne û vegeriyane Asyayê. Li gorî Herodot: Ermen li Belqan bi cih bûbûn, ermen tevlî gelê hîtîtî bûbûn û piştre ew kirbûn bin kontrola xwe.



Piştî rûxandina imperatoriya Hîtîtî herêma rojhilat (Hayaso) ket bin kontrola ermenan.
vê hebûna ermenî bi vî awayî têrê nedikir ku xweseriyke ermenî ya serbixwe ava bibe. Di sedsala 7'an B.Z de, gefên imperatoriya Asûrî bi taybet li ser med û babilan pir bûbûn.
Piştî rûxandina imperatoriya Asûrî bi destê med û babilan, di sala 612'an de ermenî tevlî medan bûbûn û birêveberiyeke xweser ava kiribûn.

## Çand û Sincê Ermenan:

Taybetiyên çanda ermenî xwe dispêrin muzîk, dîlan, wêje û belavbûna erdîngariyê ji şêniyan re, çanda ermenî bi taybetiyên xwe gelek nêzî çanda gelê Rojhilata Navîne. Girîngiya vê çandê ew e ku girêdanekê di nava Ewrupa û Asyayê de çêdike.

## Zimanê Ermenî:

Zimanê ermenî beşek ji zimanê Aryen e ku li Rojhilata Navîn dijî. abceya ermenî ji destpêka sed sala 5'an ve û bi rêya Mîsrob Maşdotis hatiye danîn.

## Ermen û Ol:

Di sala 301'ê de ermen netewa yekem bû ku xiristiyantî bi awayekî fermî kirin ola dewletê, vê jî bandorên pir mezin li çanda ermenî kiribûn û bi taybet di hunera endezyariya avahîsaziyê de mînaka wê ya ku ta roja me ya îro berdewam e dêra Zifar Tnatis e.

## Hunera Ermenî:

Hunerê cihekî taybet di çanda ermeniyan de dîtibû û gelek hunermend, wêjevan, helbestvan û sazkarên ermenî bi awayekî hunerî û xweşik hunera xwe ava kiribûn.
Yek ji pişaftinên ku hatine kirin komkijiya ermenan ya ku bi destê desthilatdariya Osmaniyan di sala 1915'an hatibû kirin û roja 24'ê Gulanê her sal salvegera komkujiya ermenan e.

## Pirsên Nirxandinê

1. Çand û sincê ermenan lêkolîn bikin.
2. Komkujiya bi serê ermenan de hatiye, lêkolîn bikin.

# BEŞA DUYEM: TÊKILIYÊN ÇAND Û SINCÊ

- **ENCAMÊN KU ÇAND DERDIXE HOLÊ**
- **DI ÇANDÊ DE HUNER**
- **CIVAKBÛN Û SINC**
- **TÊKILIYA SINCÎ BI BAWERIYÊ RE**

**Wane 1**

# ENCAMÊN KU ÇAND DERDIXE HOLÊ

Em dikarin encamên ku çand derdixe holê, wiha rêz bikin:

1- Çand, di wateya giştî de ji bo mirov, kom, û civakan tiştên ji bo jiyana wan pêwîst, dabîn dike.

2- Çand, cudahiya civak, kom û neteweyan derdixe holê.

3- Çand, nirxên herêmî, netewî û gerdûnî bi mirov û netewan dide nasîn; yekbûneke civakî û lihevhatî, pêk tîne.

4- Çand, kesayeta civakî (nasnameya çandî) bi mirov dide bidestxistin.

5- Çand, ji civakê re taybetiyên ku ji derdora xwe ya xwezayî re nêzîkbûneke rast û di nava hevsengiyê de jiyîn li ser bingehê sûdgirtineke rast, dide çêkirin.

## DI ÇANDÊ DE ZIMAN:

**"Zimanê mirov, mala mirov e."** Ziman, wek têgîna bingehîn a çandê, taybetî, hîm û stûna bingehîn a mirov û mirovbûnê ye, berhema jiyaneke hevkar, hevpar, hevgirtî û jiyana civakî ye; di nav têkiliyên hilberînî, afirînerî û danûstandinên civakî de wekî navgîneke bihevşêwirîn, lihevkirin û jihevfêmkirinê derketiye holê. Bi gotineke hîn gelempertir bîra çandê ya civakî ye. Mirov dikare bêje: Her tiştê ku di xwezayê de hebe û di mejiyî mirov de li hemberî wateyekê bê, ziman e. Lewre ji destpêka dema ku mirov ber bi mirovbûnê ve ango ber bi civakbûnê ve dimeşe, hem di hêla giyanî û hem jî di hêla daringî de, ji aliyekî ve rastî pir bûyer, rûdan, bobelat, astengî, bextreşî, zor û zehmetiyên pir giran û dijwar tê; ji aliyekî ve jî di encama ked û serkeftina di têkoşîna li hemberî wan tiştan de rastî pir bextewarî, serfirazî, dilxweşî û şadiyan tê.



Nivîsa Mîxî

Mirov, hemû çêkerên xwe bi hizirînê diafirîne, Di hemû destkeftiyên ku afirandine de, vedîtina hizirê diyar dike. Dibe ku her civak an jî komê, hemû afirandinên xwe di hişmendiya xwe de pênase nekiribin, lê belê mirov dikare di ziman û hizirîna wan civakan de şopa wan a dîrokî bibîne. Têkiliya çand-hizir û çand-ziman di aliyê vedîtina cudahiya nasnameyên civakan de girîng e. Ziman girîngiya têkiliyên mirovan dide zanîn.

## DI ÇANDÊ DE PERWERDE:

Têgehên çandê, bi rêya ziman tên ragihandin. Her civak, nifşên xwe bi rêya perwerdeyê amade dike. Di civakê de bi rêya perwerdeyê nirxên çandî derbasî nifşên nû tên kirin. Ji ber vê jî, di civakan de gelek rêbazên dewlemend ên perwerdeyê hatine pêşxistin, weke: dibistan, zanîngeh, akademî û hwd.



Di sazûmankirina perwerde û hîndekariyê de huner, ziman û nivîsîn, cihekî diyarker digirin. Di encama sazîbûna ziman û ragihandinê de "perwerde" derketiye holê. Di saziyên perwerdeyê de civak bi awayekî sazûmankirî û birêkûpêk zanist, zanabûn, nirx û pîvanên xwe bi nifşên nû dide fêrkirin û bidestxistin.

Ji taybetiyên bingehîn ên çandê "hînkirin" bi rêya perwerdeyê hatiye pergalkirin. Guherîna civakî, bi taybet di civakên roja me de, bi awayekî lez tê dîtin. Ev guherîn, di roja me ya îro de piranî bi zanabûn û plankirî bi rêya saziyên perwerdeyê tên pêkanîn.

Pisporbûn û kûrbûna di qadên cur bi cur ên çandê û asta hizirê de pêş dikevin bi rêya perwerdeyê tên hînkirin.  Tenê bi rêya perwerdeyê, mirov dikare bigihêje asta pêşketin û nûbûnên zanistî yên feraseta rast a çandê.

## Pirsên Nirxandinê

1- Encamên ku çand derdixe holê, binvîse.
2- Mirov bi milyonên salan beriya zayînê, bi çi awayî ziman bi kar aniye?
3- Hînkirin, bi riya çi tê pergalkirin?

**Wane 2**

# DI ÇANDÊ DE HUNER



Yek ji nîşaneyên bingehîn ên çandê, huner e. Huner, nîşaneya rewanî ya çandê ye û rûyê çandê yê bi ken e.

Huner, bi pênasekirina raman û hestan a bi awayekî ciwanî derdikeve holê, bingehê civak û mirovan ji nû ve tê şîrovekirin û watedarkirin.


Di afirîneriya hunerî de derbirîna hest û hiziran bi rêya muzîk, helbest, şano, dîlan û hwd çêdibe.

Hunermend û wêjevan, bi nirxên civakê dagirtî ne û bi wan huneran xwe û civaka xwe ava dikin. Dema ku bingeha çandî tune be, huner dernakeve holê. Lê hunermend dema ku berhema xwe bi alîkareya wêjevanan ava dike, di kesayeta xwe de, tiştan li nirxên civakê zêde dike û cîhana xwe ya hest û ramanan vediguherîne berhemeke çandî ya rewanî.

Çanda civakê, di berhema hunerî de xwedî risteke bingehîn e. Bi rêya hunerê jî, asta çandî ya heyî digihêje asteke bilindtir. Çand, berhemeke hevpar dide hunermend û bi rêya hunerê li civakê vedigere.


Hunermend û wêjevan, ew mirovên ku çavdêriya bûyeran dikin, raman û şîroveyên xwe bi awayekî xweşik vedibêjin û vedigerînin hunerê.

Huner, rastiyên civakê bi mirovan didin nasîn û wan gavekê bi pêş ve dibe. Huner, wijdana civakê ye. Êş, kêfxweşî û pirsgirêkên civaka xwe, dike berhemeke çandî û bi civakê dide jiyîn. Wê hunerê, dike malê civakê. Ji bo çareseriya wan, civakê digihîne û berê wan dide çareseriyê. Bi vê yekê re pêşengiya guherîn û pêşveçûna civaka xwe dike. Ji bo ku civak nirxên çandî bipejirîne û ragihîne nifşên nû, rêya herî bibandor û mayînde huner e. Nîşaneyên nirxî û çandî, tevna civakê pêk tînin. Huner jî, di vî warî de rista xercê (cebil) dilîze û di parastina destkeftiyên şoreş û azadiyê de jî cihekî taybet digire.


Mihemed Şêxo

Nirxên çandî yên civaka herî baş, bi rêya hunerê, tên parastin, pêşxistin û ragihandin. Di heman demê de ev nirx, dîsa dikarin bi rêya hunerê bên rûxandin.

Bi rêya çandên biyanî û pişaftinê, çanda lasayî, arabeskê û çanda nasyar pêş dikeve. Feraseta hunerê ya sexte pêş dikeve. Ev rewş, çanda kurdî ya kevnar, ji nirxê wê dûr dixe û biçûk dike. Bi vî awayî, feraseta mezaxtinê pêş dikeve û her tiştê hunerê dikeve qada bazirganiyê. Divê em herî zêde li dijî wan derkevin û têbikoşin. Ger di roja me de guherînek û pêwîstiya veguherînê bê xwestin, li vir xala herî girîng ew e, ku mirov çawa temaşeyî raboriya xwe bike û çanda xwe ya derbasbûyî bigire dest. Ji vî alî ve di guherîna nasnameya çandî de tiştên ku herî bibandor û diyar, derbasî mirov bûne tore, nirx, kêrhatin û her aliyên kombûnê ne. Ev, di jiyana mirov de risteke girîng dilîzin.


Ehmedê Xanî

Di roja me de çawa hundirê çandê hatiye valakirin û ji cewherê wê hatiye dûrxistin. Pêwîst e, ji aliyê mirovan ve balkişandina li ser vê rewşê bê çêkirin. Destkeftiyên çandê yên ku hatine daxistina pileya firotinê, nîşan didin ku herî zêde di qada hunerê de pêşketine. Çand, bûye hunereke firotinê. Ev qada ku hemû destkeftiyên çandî yên civakê lê kom dibûn, êdî şahidiya qada herî xerab dike. Di destkeftiyên hunerê de tişta herî bedew bingehgirtin e. Bandorbûna ku bermahiyeke hunerî li pey xwe hiştiye, mirov dikare bilêvkirina xweşik binirxîne, lê belê mentiqê gihandina aboriyeke zêde ya ji bo bazarê, huner ji çawaniyê dûrxistiye.

Di nava çanda nasyar de aliyê herî bibandor ê ku tê bikaranîn, aliyê hunerî ye. Dema ku xwesteka nasyarbûnê dikeve mejiyê her mirovî, wê pêwîst bike ku ji bo nasyarbûnê neçar in, ku li gorî wan qalibên hatine nîşandan tev bigerin. Li gorî wan qaliban tevgerkirin, ta cihekî mirov dibe xwedî asta nasyarbûnê.

Di rastiya kurdan de ev gelekî vekirî tê xuyakirin. Ji bo kurdên li her deverên Kurdistanê dijîn, ev bi vî awayî ye. Li Tirkiyê, mirovên ku herî baş bi tirkî daxivin, li Sûriye, mirovên ku herî baş erebî dizanin, li Îranê mirovên ku farisî mîna zimanê xwe yê dayîkê dibînin, nêzîkatiyên bi vî awayî gelek in. Aliyek din ê ku em rexne dikin jî, bandorbûna bi zimanê Ewrûpiyan e.


Pêwîst e mirov gelek zimanan bizane, lê belê pêwîst e ber bi tunebûnê ve neçe. Ji zimanê xwe yê dayîkê revîn, yan jî dûrketin û biçûkdîtin, di heman demê de xelasbûn û tunebûna wî zimanî ye.

## Pirsên Nirxandinê

1- Di afirîneriya hunerî de derbirîna hest û hiziran, bi rêya çi çêdibe?
2- Hunermend û wêjevan, ji bo pêşketina civaka xwe risteke çawa dilîzin?
3- Li hemberî hunera sexte, rista me çi ye?
4- Çend hunermend û wêjevanên kurd ên navdar ên di warên cuda de, bi nav bikin.

**Wane 3**

# CIVAKBÛN Û SINC



Heyîna mirov bi xwe, berhemeke hebûna civakî ye. Rastiya civakî hem sedem, hem jî encama mirovbûnê ye. Civakbûn û mirovbûn, du rastiyên ku bi hev re di rewşa pêkhatinê de ne. Çawa ku civak nebe, mirov nikare cudahiyeke watedar û dewlemend bi dest bixe; eger mirov jî nebe, hizirîna heyînekê weke çêbûna civakê, ne gengaz e. Heyîna ku "civak" jê re tê gotin, dahênana herî mezin e ku bûye sedema afirîneriya mirov derkeve holê. Di vê wateyê de dahênana ku dayîka hemû dahênanan e di jiyana mirovan de dergehê pêşketinê vekiriye, dahênana civakî ye.

Di dema civaka komînal de, bi vê rêgezê jiyan ava bûye. Mirovên ku di her têkiliyên civakî de bê neçariya zagonên nivîskî, bi hêza pêkanîna her sezayî hîs bikin jî, di zanabûna erkên xwe de bûyîn, pîvanên çand û sincbûnê, diyar dikin.

Di çand û sinc de ji bo ku seza negirin, gotina, "li şûna ku em wisa tevgerê nekin, bi vî awayî tevgerê bikin, baştir û rastir e" heye. Yên ku di encama pêwîstiyên jiyanê de çêbûne, hatine rewşa nasname û kesayetê, liv û tevgerên ku derketine asta pêş reftarên xwezayî jî, çand û sinc bilêv dike.



Zanîna bi hev re jiyîn, parvekirin û nirxên weke van, di çalakî û pîrozbahiyan de, amadebûna sincî ye. Weke gelek taybetiyên mirov ji civaka xwe digire, di heman demê de rêgezên sinc jî, ji civaka ku di nav de dijî, fêr dibe. Li gel têgeha sinc, gelek caran di heman wateyê de têgeha etîk jî, tê bikaranîn.

Etîk: Bi wateya giştî ya ku başiyê, yên baş, xwezaya reftarên baş, cewherê wê û jêdera wê lêkolîn dike, ango etîk teoriya sincî ye û bersiva van pirsan lêkolîn dike.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Têkiliya di navbera civakbûn û mirovbûnê de diyar bikin?
2- Etîk tê çi wateyê?
3- Têkiliya di navbera sinc û etîkê de çi ye?
4- Ji bo ku civakbûn berdewam bike çi pêwîst e?

Wane 4

# DI CIVAKÊ DE RISTA SINC

**"Sinc, wijdanê civakê ye û civak, bê sinc nabe".**



Civak, çand, sinc û mirov weke goşt û neynûkê bi hev ve girêdayî ne. Çawa ku di navbera lebatên mirovan de ji aliyê kar û karkirinê ve cudahî hene û çawa ku ji bo her lebat kar bike, pêwîstî bi oksîjen, xwîn û tîmarê heye ev jî, di bingehê rayan de tên veguhestin, sinc jî di nava civakê de risteke bi vî awayî dilîze. Ji bo ku her lebat bikare kar bike, pêwîstî bi tiştên ku di lebatên din de heye, bigire. Çawa ku ji bo dîwarek baş bimîne, pêwîstî bi xercê (ceblê) heye, ji bo ku mirov jî ji hebûneke fîzîkî derkeve û bibe heyîneke xwedî hest, afirîner û xwedî hizirîn, pêwîstî bi xercekê heye û ev xerc jî, since. Her mirov, wê bi serê xwe bimîne, çi bixwaze wê bike. Ger bi vî awayî be, ji xwe civak jî nabe. Wê bibe kerî, wê bi zagona desthilatdar bimeşe. Yan jî, di roja me de, di pergala kapîtalîst de bi awayekî zelal derketiye holê, ku wê rê li pêşiya desthilatdariyeke bêsînor veke

## Rista sinc a di têkiliya di navbera mirov û civakê de:

Ger civakbûn nebûya wê mirov, weke ajalan bimana. Çawa ku di ajalan de kerî, yan jî ref hene, di mirovahiyê de jî civakbûn heye. Her wiha, çawa ku piraniya tiştên li ser rûyê erdê bi komî dijîn, koma mirovan jî, civaka wan e. Lê kombûna mirov, ne weke kombûna ajalan e. Ji ber ku kombûna mirov, bi hizir û hestan pêk hatiye. Ger mirov bi tena serê xwe bimaya nedikarî biaxive, ne jî dikarî pîşeyan ji bo jiyana xwe peyda bike û di encamê de mirov nikare bi tena xwe bijî.

Ger civak nebe, keda ku mirov dide nayê dîtin, ango bê wate dimîne. Bi kurtî, mirov bi tena xwe bê wate ye, weke darekî hişk û kevirekî li erdê ye.

Her çi qas, îro teknîk pir pêşketiye jî, lê tiştek nikare têkiliyên mirov ji mirovên din qut bike. Ji xwe, teknîk bi xwe jî encama pêşveçûna civakbûna mirov bi xwe ye. Tişta ku em dikarin li vir bêjin, ew e ku nirxên di civakê de dibin sedem ku mirov neçariyê hîs bike ku bi hevrebûn pir pêwîst e û ev jî, sinc bi xwe ye. Sinc, ji ber ku bi bîr û baweriyan re têkildar e, bi mirov wijdan ava dike. Ji ber vê yekê, sinc di heman demê de rewaniya mirov bi xwe ye jî. Sinc bi xwe hêza afrandina mirovan e.

Ji ber wê jî, sinc ji jiyana civakî re rê li pêşiya azadîxwazî, bi vîna xwe tevlîbûnê, vedike. Sinc, mirov kiriye xwediyê berpirsiyariyeke mezin.

Mirovên ku xwedî berpirsiyarî bin, ew mirov in ku di zanabûna berpirsiyariyên civakî de ne jî.

Ev zanabûn bi xwe, sinc e. Berpirsiyarî, mirov dike endamên baş ên civaka xwe jî. Mirovên ku berpirsyariyên xwe bizanin di civakê de ji wan re rêz tê dayîn. Her tim civak, wan weke mînak dipejirîne. Tiştên ku dibêjin civak pê bawer dike. Em ji bîr nekin ku bê berpirsyarî, bê sincî ye. Bêsincbûn, dibe sedem ku civak parçe bibe, bêmafî çêbibe, hin birçî û hin jî têr bin. Mirovên bisinc, ji bo jiyaneke baştir berpirsyariyên xwe bi kêfxweşî pêk tînin. Hêza sinc a dayînkirinê tevna sincî ya civakî ye. Mirovekî xwedî taybetiya berpirsyariyê, çirkeyekê jî di cihê xwe de nasekine. Mirovên ku xwedî berpirsyarî û hestên berpirsyariyê ne, ew xwedî sinc in. Bê berpirsyarî, tevgerkirin bêsincî ye. Mirovên bisinc, berpirsyariyên xwe bi dilxweşî pêk tînin.

## Pirsên Nirxandinê

1- Têkiliya di navbera sinc û civakê de çi ye?
2- Mirov, gelek taybetiyên xwe, ji ku digire?
3- Ger sincê mirovekî/ê nebe, wê ew mirov bi çi awayî be?

**Wane 5**

# TÊKILIYA SINC A BI BAWERIYÊ RE



Ji bo sinc bawerî pêwîst e. Ji aliyê sincbûnê ve ji zanistî hizirînê zêdetir, pêwîstî bi baweriyê heye. Ji bo ku mirov bibe xwedî sinc, pêwîst e destpêkê bi hin tiştan bawer bike.

Zanistê, gelek destkeftî û nirxên dewlemend derxistine holê. Lê belê, ev nayê wê wateyê ku mirov û civak tenê bi zanabûnê dibin sincî. Dibe ku bibe xwediyê gelek pergalên ku pirsgirêkên civakê sererast bike, lê belê ev jî nayê wateya bisincbûnê.

Mejiyê mirovên destpêkê her tim bi baweriyan dihizirî. Ev ji tevgerên mirovan tevlîbûna wan a civakî û pêvajoyên nêzîkbûna mirovan re, rê li ber sincbûnê vedike. Ji ber ku ji tiştên ku li derdora wan çêdibin bi bawerî têdigihêjin, nizanin û bawer dikin.

Bi xwezayî îro tişta ku em weke hişmendî digirin dest, hemû qalibên hizirînê, hemû pêvajoyên hizirwarî ji koka sincîbûna mirovan e. Ango li ser forma baweriya destpêkê pêş dikevin. Sedema wê bawerî û sinc tune be, civak nikare xwe li gel hev bigire. Ji ber ku ev nirx, xerca civakî ne û wijdana wê ye. Çawa ku em dikarin ji mirovahiyê re bêjin, hebûneke çandî, di heman demê de em dikarin bêjin ku hebûneke sincî ye jî. Ji ber ku heyîna sinc, rasterast bi mirov re têkildar e.



Bi pêşketina jiyana civakî re dest pê dike ta pêvajoya guherîn û kûrbûnê têgeheke rewanî ye.

Civak, tenê dikare bi dadweriyeke azad, ji aliyê sincî ve were sererastkirin. Ji ber ku sinc, bi ezmûna mirov a hilberînê ve girêdayî ye; bi azadiyê re, ji nêz ve têkildar e.

Sinc, azadiyê bi xwe re tîne. Bi bingehgirtina sinc re azadiya xwe diyar dike. Cihê valabûna olê, dikare bi awayekî felsefî, ramyarî û xeta aborî, dagire, lê belê cihê valabûna sinc, tu tişt nikare dagire. Divê rewşê de civak dikeve rewşa kole û miriyan. Ji ber vê yekê, em nikarin bi civakeke bêsinc bihizirin, civaka bêsinc hemû rûmetên xwe winda dike. Rêya herî hêsan a hilweşandina civakekê, têkiliya wê civakê ya bi sinc re qutkirin e. Lewazkirina bandoriya olê, ne bi qasî xerabkirina sincê civakê ye.

Weke teoriya sinc, etîk û sincbûnê weke pirsgirêkên bingehîn ên felsefî her ku diçe rewşeke xerabûnê digire.

## Pirsên Nirxandinê

1- Cudahiya di navbera kombûna mirov û ajalan de çi ye?
2- Wijdan, bi mirov re çawa ava dibe?
3- Pêşketina teknîkê, encama çi ye?
4- Têkiliya di navbera sinc û berpirsyariyê de çi ye?

**Wane 6**

# SINCÊ AZADIYÊ

Sinc, beriya her tiştî, di mirov de li hemberî şaşîtiyan, zanabûn û vîna têkoşînê çêdike.



Sinc, nahêle ku xerabî, bêmafî, nebaşî, zordarî û hwd. di jiyana civakî de serwer bibin. Mafên mirovên din jî,weke mafên xwe diparêzin û ev jî, ji zanabûna sincê tê. Ji ber vê yekê, mirovên ku sincê wan nebe, yan jî kêm be, li hemberî mirovên din dikarin hemû nebaşiyan bikin.
Mirovên ku di aliyê sincî de pirsgirêkên wan hebin, zordar in. Mirovên ku sincê wan tam be, yan jî di asteke baş de be, beriya her tiştî li dijî bêmafiyên ku têne kirin serî radikin. Mirovên bisinc, her tiştî di lêpirsînê de derbas dikin, piştre dipejirînin.

Mirovên ku xwedî sinc in, hertim di nava lêgera jiyaneke baştir de ne. Ger ku hin bixwazin jiyanê xerab bikin, li dijî wan derdikevin. Ji bo vê jî, sinc di mirov de rê li ber bijartinê vedike. Ji ber ku mirovên bisinc, her tiştî hema napejirînin. Ev taybetî, dibe sedem ku her tim di nava civakê de têkoşîn li dijî bêmafiyan hebe. Mirovên ku zordar bin jî, ji bo ku zordariya wan berdewam bike, her tim hewl didin ku mirov û civakeke bêsinc hebe. Dema ku mirov li dîroka şaristaniyê temaşe û guhdar dike, rastiya ku bêsincbûn çi tîne serê civakê, mirov baştir û zelaltir dibîne.

Mirov, çi qas bê sinc be, ew qas jî kole ye. Desthilatdar jî beriya her tiştî ji civakê, nirxên wê yên sincî digirin ji bo ku mirov dijî wan têkoşînê nemeşîne. Ji ber vê yekê, mirovên ku pirsgirêkên wan ên sincî nebin, serbilind in. Di mijara pirsa azadiya civakê de pêşeng in. Xwe ji bo başî, rastî û xweşikbûna jiyanê dikin qurban û dibin mînakên wêrekiya jiyana

civakî. Ji ber ku mirovên sincî, mirovên xwedî wijdan in, li hemberî bêdadî, stemkarî û zorê tu metirsiyan naxin berçav û li hemberî wê derdikevin. Mirov dikare bêje ku sinc nebe, di civakê de tu guhartin jî çênabin.

Sinc, hêza guhartina civakan e. Ev guhartinên ku bi destên desthilatdaran tên çêkirin, civakê dikin kole. Ger bi destên mirovên xwedî sinc hatibin çêkirin jî, jiyanê ber bi azadiyê ve dibin.

Mirovên xwedî lêgera azadiyê, têkiliya wan herî zêde bi sinc û wijdan re heye. Di mijara azadiyê de divê mirov bi ezezî nêzîk nebe.

Azadî, di cewherê xwe de lêgerînek e. Azadî, jiyanê tîne rewşa jiyînê, vîna xwenasînê, berpirsiyariyên xwenasînê, gihîştina zanabûna mirovên ku di nava civakê de xwedî şêwe ne. Mirovbûn, azadî bi xwe ye. Tiştên ku em dixwazin mirovbûn bi xwe bide têgihandin afirandin, guhertin, xwe berpirsiyar dîtin û kêfxweşiya mirovên din e.

Ev hemû, di rastiyê de xalên ku hev temam dikin, lê di civaka dewletparêz de, bi taybetî jî, qonaxa wê ya sermayedar, di hemû qadan de, ji ber ku nirxên mirovahiyê tên parçekirin, van tiştên bi vî awayî her weke ku qet têkiliyên wan bi hev re tune ne, digirin dest.

Hemû hilberînên heyberî û rewanî, komî ser civakê dikin, pêwîst e di nava tevahîbûnekê de were destgirtin. Bi taybetî, tişta jê re tê gotin, dilpakî (başiya ku sinc pesnê wê dide, dilnizimbûn, qehremanî, navê giştî yê cewheriyên weke rastî û qenciyê) ku têkiliya taybetiyên mirovan bi hev re bizanin, pêwîst e di nava tevahiyekê de em bigirin dest.

Civakek çi qasî di warê zanabûn, çand û hêza sincî de xwe kûr kiribe, ew qasî nêzîkî azadiyê dibe, ev gotin di cih de ye. Her wiha, civakek çi qas di warê nirxên çandî û sincî de dûr hatibe hiştin, ew qasî kole û bin dest dibe. Ev gotin jî, rast û di cih de ye.

## Pirsên Nirxandinê

1- Sinc, kîjan nirxên neyînî ji nava civakê radike?
2- Sinc, çawa di mirov de rê li ber bijartinê vedike? Şîrove bike
3- Di navbera guhartina sincî ya civakê û ya desthilatdaran de çi cudahî heye?
4- Tişta ku em dixwazin mirovbûn bi xwe re bide têgihandin, çi ye?
5- Civaka dewletparêz, bi taybet jî qonaxa wê ya sermayedar, çi ji nirxên mirovahiyê dike?


# BEŞA SÊYEM: DI DÎROKÊ DE ÇAND Û SINC

- **DI DEMA PALEOLÎTÎKÊ DE ÇAND Û SINC**
- **DI DEMA NEOLÎTÎKÊ DE ÇAND Û SINC**
- **AVABÛNA PERGALA JINÊ–DAYÎKÊ**
- **ÇAND Û SINC DI ÇÎNAYTIYÊ DE**
- **ÇAND Û SINC DI DEWLETÊ DE**

**Wane 1**

# DI DEMA PALEOLÎTÎKÊ DE ÇAND Û SINC

Serdemên Paleolîtîk, Mezolîtîk û Neolîtîkê xwediyê dîrok û çandeke pir mezin in. Ev her sê serdem navên xwe ji çek û kevirên ku di wê demê de hatinê çêkirin digirin. Bi bikaranîna hestî û textan ev nav li van serdeman hetiye kirin. Serdema kevirî bêtirî 7 milyon sal berdewam kiriye. Bi lêkolînên bê hejmar ên dîrokî û erkeologiyê hin rastiyên şaristaniya mirov derketiye holê. Ev lêkolînên ku hatine kirin, hin kêliyên jiyana mirovan derxistine holê. Em li gorî encamên van lêkolînan di derbarê bingehên wan deman de agahî distinîn.



**PALEOLÎTÎK ÇI YE?** Di dîroka mirovahiyê de dîroka serdema herî kevn û herî dirêje. Li gorî lêkolînên ku hatine kirin, berî 2-3 mîlyon sal dest pê kiriye. Taybetiya wê ya herî sereke pêşketina mirovan e. Derbasbûna mirovbûnê, avabûna pergalên mirovên destpêke ye. ji vê demê re Dema Kevirê Kevn tê gotin. Li Anatoliyayê ji berî 2-3 milyon sal dest pê kiriye û heya 20000 sal b.z berdewam kiriye. Ji ber avhewaya sar û qeşayê mirov jiyana di şkeftan de jiyane. Mirovên vê demê destpêkê kevir weke ku heyî bi kar anîne û bi demê re kevir hatine xeritandin û mirovan yekemîn amûr û diving çêkirine. Jiyana xwe li ser nêçirvanî û komkirina şîntiyan berdewam kirine.



### Taybetiyên Vê Serdemê

- Bingeha mirovên modern ên îro di vê serdemê de hatiye danîn.
- Taybetî û şewazê mirovan di vê demê de hatine girtin.
- Yekemîn amûrên hilberînê di vê demê de hatine çêkirin.
- Mirov li ser nêçirvanî û komkirina gihayan jiyane
- Mirov, li ser keskayî,  fêkî, kokên daran û lewirên ku nêçîra wan dihate kirin, dijiyan.
- Jiyana wan ne jiyaneke niştehcihî bû ji ber avhewa û mercên erdnîgariyê her dem di nava koçberiyê de bû.
- Jiyana xwe di şekftan de berdewam dikirin.

Li gorî lokolînên ku hatine kirin, li Afrîka beriya 200-300 hezar sal mirovê neadertal hatiyê dîtin. Bejna wan bilind û bi hêzin. Her wiha di lêkolînên erkolîjîk de çêkirina riman, kêra  serê tîran hatine dîtîn. Li ser lat û zinaran wêneyên ku hatine neqşandin dide diyarkirin ku Avahiyek civakî pêş ketibû, mirov bi komên mezin bi hev û du re dijiyan. Nirx didin mirovên temen mezin. Di wan wêneyan de nêçirvantî, hûner û hin fîgûrên (dirûv) jinan hatine çêkirin.

## Pirsên Nirxandinê

1- Dema Paleolîtîkê şîrove bikin.


2- Taybetiyên vê serdemê çine?

3- Encamên ku wê ji vê mijarê derxistî çiye di refê de bi hevalên xwe re parvebikin.

**Wane 2**

# DI DEMA PALEOLÎTÎK DE ŞÊWAZÊ JIYAN, ÇAND Û SINCÊ CIVAKÎ

Ji dema destpkê ku mirov xwe ji lawiran cuda dike (mirov êdî rêbazê jiyanê ji xwere di afirîne û nema li gorî şopandina lawiran dijî) re, dema klanê ya civaka xwezayî tê gotin. Girîngiya vê demê bingehê xwe ji destpêka mirovbûnê û şêwazê hebûnê digire. Klan, dayîkbûna civakê ye, bîranîa destpêkê ye, zanist û baweriyê di wê demê de bingeh digire. Ji ber ku mirovên destpêkê amûrên kevir bikar tanîn, jê re "dema kevirên kevn" (Dema Paleolîtîkê) tê gotin. Em dikarin bêjin dema destpêkê ya hilûkirina amûran bi milyonên salan berdewam kiriye.



Hejmara endamên klanê derdora 20-50 kesî bû. Civak, li derdora jinê dihat avakirin, jiyana xwe bi komkirin û nêçîrê berdewam dikir. Tiştên ku kom dikirin, malê her kesî bû. Jin, karê komkirinê dikir û zilam jî, nêçîr dikir. Ev şêwazê kar û parvekirinê, rê li ber kesayet û çandê vedike. Ji ber ku klan, ne civakeke pir tevlîhev e, mirov nikare dabaşa pirsgirêkan bike, çi qasî amûr û agir tên vedîtin û pêş dikevin, mirovbûyîn jî, ew qasî bi leztir pêş dikeve. Ji ber ku klan, destpêka civakîbûnê ye, ji ber vê jî, tu kes li derveyî vê civakê namîne. Endamên klanê bi hev re yekpar in di nava yekîtiyê de ne, wekhevî zagoneke jiyanî ye; "ger wekhevî nebe, jiyan nabe" . Ji ber vê yekê jî, endameke/î klanê, nikare li derveyî kilanê bijî. Di klanê de jiyîn, rêgezeke bingehîne. Di klanê de pîvana hemûyan jî, bingeh e. Kesek di nava klanê de weke kesayeteke cuda, yan jî li ser klanê desthilatdariyê bike, nayê pejirandin. Jiyana klanan, bê serwerî, bê çîn, bê hiyerarşî û bê mêtingerî ye. Di nava jiyana komînal û civakî de, sincê herî mezin berdewamkirina vê jiyanê ye, bê sinciya herî mezin jî,

dûrbûna ji civakê ye. bi qasî ku mirov di nava civakê de dibe, dibe bi hêz, ger ji derveyî civakê be, dibe sedema tunebûna xwe.
Bi vî awayî, em dikarin encaman derxin ku cureyên mirovan ên yekem, di nava hevkariyê de ne û ji hev re dibin alîkar. Di destpêkê de di nava vê civakê de desthilatî, berjewendî û hevrikî tune ne. Her wiha, di jiyana klanê de dayîk bi xwezayê re mezin dibe, girêdana dayîk û xwezayê, weke girêdana dayîk û zarok e; yekbûna bi xwezayê re girînge. Ji ber ku klan bi hêza jinê ve girêdayî ye, bi xwezayê re di nava yekbûnekê de ye. Dema ku em vê dibêjin, em nirxên mirovî derdixin holê. Di heman demê de civakeke bi tendurist derdixin holê. Têgeha azadî û wekheviyê, di şêwaza jiyana klanê de bi xwe derdikeve û ev mijareke girînge. Îro bi şêweyekî zanistî jî, ev têgeh hene, wateya azadî û wekheviyê jî heye.
Şêweyê baweriya klanan, toteme. Ger lawirek, an jî giyayek di jiyanê de risteke bingehîn bilîze, ew dibe totem. Sembola wê, tabûyên wê ne. Di baweriya totemê de têkiliya desthilatdariyê tuneye. Totem, weke baweriyeke pîroze û mirov nikare dest bavêjê, tê pejirandin. Di heman demê de ji totemê re rêzgirtin, tê wateya ji hebûna xwe re rêz girtin. Totem, sembola zanista klanê vedibêje. Ger em bêjin, cara yekem tê şênberkirin, ev ne gelekî şaşe. Klan bixwe pêşeroj û roja îro digire nava xwe. Bi kurtahî, mirov dikare bêje ku totem nasnameya klanê ye. Klan bi totemê ve tê girêdan, ji hev hêzê digirin û hebûna xwe bi wate dikin.



**Dema Mezolîtîkê** (Dema Kevirî ya Navîn)**:**
Di dema Mezolotik 20000-12000 B.Z de, ji ber helandina qeşayê di xwezayê de pir guhartinên cûda pêşdikevin. Ev gûhartin dihelê ku hem di mîle hilberînê de hem di milê çêkirina amûran de pir gûhartinên cûda çêbibin. Ev dem demeke derbasbûnê ye. Mirov hêdî hedî ji şikeftan derdikevin û ber bi cihên av û çeman ve diçin û derbasî jiyan civakî dibin.

## Pirsên Nirxandinê

1- Klan çi ye? Şîrove bike.
2- Klan, di bin kîjan mercan de Jiyaye?
3- Şêweyê baweriya klanê, bi çi awayî bû?

**Wane 3**

# DI DEMA NEOLÎTÎKÊ DE ÇAND Û SINC

## (12000-4000B.Z)



Civaka Neolîtîkê piştî ku dema qeşayê bi dawî bû, li hemberî avhewaya hişk û şûn ve êdî mirov li deverên zincîra çiyayên Toros û Zagrosê ên ku di destkeftiyên dîrokî de diyar bûye, bicih bûne. Ji ber ku cara yekem bi Neolîtîkê re derbasbûna jiyana niştecihî çêdibe, ji van pêşketinên ku cara yekem tên jiyîn, re"Şoreşa Neolîtîkê" tê gotin. Cara yekem arkeologê Ingilîz Gordon Child di 1930'î de peyva "Şoreşa Neolîtîkê" bi kar aniye. Şoreşa Neolîtîkê, şoreşa kedîkirina lawiran, çandinî û avakirina gundan e. Ji vir û pê de serdema komkirin, nêçîrvanî, jiyana koçberî kêm dibe û derbasî karê hilberînê dibe. Şoreşa Neolîtîkê, li her deverê, di heman demê de şêwe negirtiye. Hin tiştên ku hatine dahênan, bi van pêşketinan re, pêşketinên civakî bi lez dikin.




Şoreşa Neolîtîkê, bi qasî ku şoreşa gunde, di heman demê de şoreşa jinê ye.

Ji ber ku jinê komkirin dikir û bingehê çandiniyê jî nas dikir, Lawirvanî û çandinî bi destê jinê pêş dikevin, ji ber ku ev du tiştên bi hev ve girêdayî ne. Ev dem, dema avakirina gundan û çandina daran e, di firaxên ku ji axê çêdikirin de xwarin dipijandin û vedişartin, kevir dibirîn, bi kelpîçan mal ava dikirin, ev tişt hemû encamên wê demêne. Hin giyayên ku di roja

me ya îro de, yan jî lawirên ku em kedî dikin, berhemên wê demê ne. Ji sifir, tiştên xemilandinê hatine çêkirin, her cihekî ku çanda Neolîtîkê derbas dibe, xwe lê bicih dike. Her tiştekî ku di jiyana mirov de bi kar tînin, pîroz tê dîtin. Ji çandinî û lawiran, tiştên tên bidestxistin, bi sûd in. Ji ber vê yekê, zad (dexlûdan) pîroz tê dîtin. Em dikarin bêjin ku têkiliya di navbera civak û xwezayê de weke têkiliya di navbera dayîk û zarokê de ye. Bi vî awayî, hilberîna civakê jî, li ser vî bingehî çêdibe.

Civaka wê demê, bi tevlîbûna hemû endamên civakê, sûdê ji wan giya û lawirên ku dinase, digire. Rêgeza jiyana wê demê, "yek ji bo hemûyan, hemû ji bo yekî" ye. Nêzîkatiyên xwedîtiya (mulkiyeta) taybet a li ser hilberînê tuneye.

Amûrên hilberînê yên tevahiya civakê ne. Kêrhatinên jiyanê yên ku hatine bidestxistin, dibin malê hemû endamên civakê. Di nêzîkatiyên endaman ên li beramberî hev de, çewisandin û xwedîtî, tuneye. Taybetiyeke bi vî awayî nayê hizirîn. Di têkiliyên civakî yên di navbera jin û mêr de mulkiyet tuneye. Civak bi giştî, li derdora jinê kom dibe. Dayîk, hem civakê bi rêve dibe û hem fêr dibe, hem jî dide fêrkirin. Ji dayîkê dûr ketin, tê wateya ji civakê dûr ketin; ji civakê dûr ketin jî, tê wateya mirin û tunebûnê. Ev rewş jî, diyar dike ku mirov bi navekî bi hev ve girêdayî ne.



Mirovên civaka xwezayî, di vê dema komkirina berheman de weke gundekî tevdigerin. Ji ber vê yekê jî, cejnan weke piştgiriyê digirin dest û tiştan belav dikin. Di vê demê de nirxên mirovahiyê, bê civak nayên hizirandin. Tişta ku bêtir di vê civakê de derdikeve pêş, pergala sincî û ramyarî ya ku pir bi hêz e. Di heman demê de jîriya dahûranî û ya hestiyarî hevûdu temam dikin û afirîneriyeke hêja derdixe holê. Ji ber vê yekê jî, mirovahiya civaka

xwezayî di warê mejî û giyanê de nehatiye parçekirin û nakokiyên çêkirî, nayên jiyîn.

Mijareke din a herî girîng ewe ku mirov ji bo Neolîtîkê bêje, eve: Pêşketina çand û zimanên Aryen e. Di vê serdemê de ziman gelekî bi pêş dikeve. Vedîtin û pêşketinên civakî, di warê ziman de, pêşketinan bi xwe re tîne. Çanda Aryen û zimanê wê, encamên şoreşa Neolîtîkê ne. Ev şoreş, her ku belav dibe, bi zimanekî diaxive, ev çand jî hêdî hêdî di nava erdnîgariyeke mezin de belav dibe, bi awayekî xwezayî bicih dibe, dibe sedem ku gelek komên zimanên Aryen derkevin.

## Pirsên Nirxandinê

1- Şoreşa Neolîtîkê, çi şêweyên jiyanê afirandine?
2- Di şoreşa Neolîtîkê de rista jinê çi bû?
3- Berhemên dema Neolîtîkê, ku derbasî roja me ya îro bûne, çi ne?
4- Têkiliya di navbera civak û xwezayê de, bi çi awayî ye?
5- Rêgezên jiyana dema Neolîtîkê, çi bûn?
6- Di warê ziman de şoreşa Neolîtîkê, çi pêşketin bi xwe re aniye?

**Wane 4**

# AVABÛNA PERGALA JİN-DAYÎKÊ



Jin-dayîkê, dîtibû ku jiyana niştecihî pêwîst e. Xwedîkirina zarokan, çandinî, li bendê mayîna darên fêkî ta bigihin, jiyaneke niştecihî jêre pêwîst e. Di rewşeke bi vî awayî de rista jinê mezin dibe û çanda xwedawendiyê pêş dikeve. Hin pîvanên di mijara tîmarbûn û têkiliyên zayendî de pêşdixe. Jin-dayîk di nava vê sazûmaniyê de ye.

Di nava êlê de jin-dayîk pêşeng û birêveber e. Ev jî, bingeha çanda xwedawendiyê ye. Rewşa rewanî nîşan dide. Xwedawendî, di cewherê xwe de jina ku şoreşa Neolîtîkê afirandiye û wê taybetiyê bilêv dike. Sembolên xwedayî, ne şêweyê zilam e, yên jinê ne û xwedawendiyê tînin ziman. Pêwîste, mirov baş bibîne ku derbasbûna hizirîna xwedatî, weke cudabûneke mezin derdixîne holê.

Peykerên ku di xebatên erdkolanê de derdikevin, vî tiştî baş nîşan didin ku di çêbûna ziman de bandora rêgeza mê diyar e. Perestgehên yekem, di gundan de tên avakirin. Nîşana afirîneriya Neolîtîkê, xwedawenda STAR e. Di belgeyên ku di şaristaniya Sumeran de derketine jî ev rastî hatiye dîtin. Çanda binavê Star, Nînhûrsag, Înanna, Eştar, Astarte, Kîbela, Afrodît li ser vê şopê berdewam kiriye. Bi kurtahî, ger em taybetiyên çanda xwedawenda dayîk bînin ser ziman, "Xwedawend" mirov û afirîner e. Li ser mirovahî û civakê, ne desthilatdar e. Bingehê vê afirîneriyê, jiyana wekhev û azad a ku bi destê jinê hatiye avakirin e. Ev nîşan dide ku di civakê de çîn û cudabûnek derneketiye. Ji ber vê yekê jî, di çanda xwedawendiyê de çîn, dewletparêzî tuneye.

Têkiliyên di navbera zarok û dayîkê de çawabin, têkiliyên civak û xwezayê jî heman tiştin; hev û du diparêzin û temam dikin.

Yekîtiyek heye, hev û du digirin û temam dikin. Ji ber ku bi kedê û afirîneriyê ve girêdayîne, pêwîstî bi mêtingeriyê nabînin. Ji ber vê yekê jî, taybetiyên aşîtiyê li berçav in, ev taybetî hemû taybetiyên civaka demokratîk in. Ji ber ku di jinê de jîriya hestiyarî bêtir li pêş e, ew jî dibe sedem ku di jiyanê de jin ji zilam zêdetir wateyê bide tiştan. Ew tê wateya ku jiyanê, rast û xwerû dibîne.

Bi hezarên salan e ku xwedawenda dayîk di bilindkirina civakê de, rolê dilîze, bingehê xwe ji wê derê digire. Civakê bi xwe jî xwedawendî bilind kiriye. Ev jî tê wê wateya ku civak bi xwe, xwe mezin dike û beramberî kedê rêzdar e.

## Pirsên Nirxandinê

1- Jiyana niştecihî ji bo jinê, çima pêwîst bû?
2- Taybetiyên çanda xwedawenda dayîk, çi ne?
3- Çend Xwedawendên jin ên di dîrokê de bi nav bikin.
4- Sedema ku di jiyanê de, jin ji zilam bêtir wateyê dide tiştan, çi ye?


**Wane 5**

# ÇAND Û SINC DI ÇÎNAYETIYÊ DE

Hiyerarşî, têgeheke Yewnanî ye. Awayê rêxistinbûna rahîban e, ango tê wateya "rêveberiya pîroz". Ji bo karên bihevre yên civaka mezin, bi awayekî birêkûpêk û bipergal werin birêvebirin, awayê rêxistinbûna tîk e.

Peyva (tîk), tê wateya ji jor ve birêvebirin. Bingehê şaristaniyê, êdî li ser çêkera tîk bi pêş dikeve. Em ji komeke biçûk bigirin, ta civaka herî mezin, hebûna wê sazûmaniya tîk, wê bibe, ferman û pêkanîn. Ji jor ber bi jêr ve ferman û biryara wê, ji rêveberê jor, ta rêveberê herî jêr, sazûmaniya têkiliyan bi vî awayî tê pêkanîn.

Gotina "yê pîroz" tê wateya ku nabe kes nêzî wê bibe yan jî wê nepijrîne.



Ev rêxistinbûna hêza serdestiyê, vedigere destpêka çerxa ku têkiliyên civakê nîşan dide. Lê bi demê re hiyerarşî, derbasî nava hemû qadên jiyanê dibe û bi cih dibe.

Dema li qada civakî ya herî biçûk, ango li malbatê were nêrîn, wê baştir were têgihîştin.

Di her malbatê de mezinekî malê heye. Di nava malbatê de mezinê malê, bav e. Dayîk jî, dikare bibe mezin. Di her mercî de rêveberek malbatê heye. Ger bav tune be, birayê mezin ango, her divê xortek hebe, lê ger xort tune be, di malê de bi neçarî jineke ku di malê de û li derve, gotina wê derbas bibe, huner an jî kêrhatiyên wê hebin, mafê bi destxistina mezintiya malê bi dest dixe. Mezinê malbatê, li ser hertiştî çavdêr e, hin karan bi xwe, hinekan jî bi kurê xwe yê mezin dide pêkanîn. Hin karan jî bi hevjîna xwe dide pêkanîn. Bi kurtî, ji bo hemû kesên malbatê kar dibîne.

Karê bêyî ku serî li mezinê malbatê bê dayîn, nayê pêkanîn, ji ber ku ferman wî girîng e. Her wiha têkiliyên malbata fireh, di navbera zilam û xizmên zilam de weke mam û biraziyan pêş dikeve.

Nirxên weke: Nav, navdarî, nijad, ev nirxên ku girêdayî zilam û ji bo dema bê, tên rakirin.

Hemû têkilî, di nava sazûmaniya xebata hiyerarşîk de wateyê dibîne. Ne hemû karên ku ji derveyî vê pêş dikevin, weke ne pêkanînê tê nirxandin. Ev, di malbatê de çêkera hiyerarşiyê ye.

Sedema ku em malbatê mînak didin, ew e ku dîrokeke civakî ya dirêj a malbatê heye. Her wiha, ji ber ku rastiyeke sazûmaniya hemû bandorên girîng ên weke neçarî û herdemî hildigire.

Ji bo kar bi awayekî rêkûpêk û çavdêrîkirî were birêvebirin, di mena jiyanê ya herî biçûk de jî, çêkera hiyerarşîk cih girtiye.

Di mal, dibistan, cihê kar û li bazarê, di navbera kal û ciwanan de, di navbera zilam û jinan de, di navbera serdest û bindestan de û hwd, di hemû qadên jiyanê de, sazûmaniyên hiyerarşîk serdestin.

Di jêdera çanda hiyerarşiyê de fermandayîn, navendgerî û takekesî heye. Rewşeke wisa standiye, ku civakeke bê hiyerarşî, nayê hizirîn. Bingehekî ku hiyerarşî tê de tune ye, di demeke wiha de nayê dîtin. Ango hiyerarşî, valahiyê nasnake. Cihê ku valahî lê hebe, teqîn lê derdikeve.

Ji civakên xwezayî, ta çêkera civakên roja me, hiyerarşî hertim mezin bûye û pêşketiye. Lê di navbera hiyerarşiya dema civaka xwezayî û hiyerarşiya civakên dewletger ên di roja me de cudahiyên mezin hene.


Hiyerarşiya bisûd a ku li ser teoriya dayîkê pêş ketiye û bi demê re gelek beşên hiyerarşiyê girtine nava xwe, hêzeke civakî ye. Tenê sûdên civakî, pêwîstiyên wê û karên wê armanc digire, ne saziyeke birêxistinkirî ye. Rêzdariya wê, li hemberî kedê, nirxê hilberanê û xizmeta ku pêk aniye, pêş dikeve. Ji ber ku di navbera mezin û civakê de li cihê fermanan, efendî û xulam tenê ji bo nasîna kar girêdaneke ragihandinê heye. Civakê, ji bo ku karên di navbera xwe de baş birêve bibe, pêşengek

hildibijart û vî/ê pêşengî/ê, tenê dema ku pêwîst dibû, tiştên ku dihatin xwestin ji civakê re radigihandin. Ev rêkûpêkiya ragihandinê jî, sazûmaniyeke hiyerarşîk e, lê ev ne tîkî ye û ne çêkereke her demî ye.

Hiyerarşiya ku bi çanda zilamtî dest pê kiriye û bi dewletê ve sazûman bûye jî, tenê girêdayî desthilatdarî, mijokdarî, dagirkerî û bertîlxwariyê ye. Beşeke ji civakê, ji bo berjewendiyên xwe, xwe birêxistin dike.

Pergala hiyerarşiyê, hemû taybetiyên civakê, yên weke:

hevparî, hevkarî, alîkarî, dostanî û hwd, ji rê derdixe û bi awayekî bê sincî van di berjewendiyên xwe û li dijî civakê weke amûrekê bi kar tîne.



## Avakirina Pergala Hiyerarşîk (çînatiyê):

Derketina berhemên pirtir, hilberîn û pêşketina amûrên hilberînê, bandorên girîng li civakê dikin û rê li ber pêşketinên mezin vedikin.

Bi demê re berhemên pirtir di şêweyên cuda de tên nirxandin, tên depokirin û hişmendiya komkirinê bi pêş dikeve. Ji bo pirbûna berhemên pirtir, pêwîstî bi hin pêkhatinên girîng heye. Bi vê re di ristên civakî de guherînên girîng pêş dikevin. Di encamê de hiyerarşiya ku zilam rêbertiya wê dike, di navbera zayendan de, nakokî û serdestiya zayendê derdixe holê.

Civaka ku ketiye destê serokan û her ku diçe şaman tê asta rahîbê serdest. Fermandarê leşkerî, her ku diçe, xwe li ser civakê serwer dike. Bi vî awayî, hêzên serwer dest datînin ser berhemên pirtir, xwe ji civakê cuda dikin û di asta herî jor de di desthilatdariyê de cih digirin û bi vê re jî, çînayetî derdikeve holê.

Di ristên civakî de, pêkanîn û di xebatan de guherîneke pir mezin derketiye holê. Ev jî, ji bo berhemên pirtir û desthilatdariyê, rê li ber şerên ku di dîrokê de nehatine dîtin, vedike.
Di heman demê de çînên jêr jî, têkoşîneke bêhempa li hemberî vê cudakarî û bêmafiyê dimeşînin.
Em dikarin bêjîn, bi pêşketina vê pergalê re bi awayekî giştî, bandora mirovan li xwezayê, ya zilaman li jinan û ya çînan jî, li çînên din dest pê dike. Bi hiyerarşiyê re, civak ji nû ve tê avakirin. Ev sazûmaniya nû, têkiliyên civakê yên derbasbûyî, awayê jiyana wan, çanda ku li ser wan pêşketiye bi awayekî ku bibe alternatîfa wê, xwe birêxistin dike. Awayê civak, çand, nasîn û sincekî nû, bi pêş dikeve. Li hemberî tiştên kevn, ango girêdayî civaka xwezayî çi hebe, awayê civakeke nû, serdestiya çînatiyê bi rêkûpêk dike û bi pêş dixe.

## Pirsên Nirxandinê

1- Têgeha hiyerarşiyê, tê çi wateyê?
2- Di jêdera çanda hiyerarşiyê de, çi heye?
3- Desthilatdarî, çawa derdikeve holê?
4- Pergala hiyerarşiyê, çawa taybetiyên civakê weke amûrekê bikartîne?

**Wane 6**

# DI DEWLETÊ DE ÇAND Û SINC

**Dewlet: Desthilatdariya zorê ya li ser civakê ye.**

Dewlet, di dîrok û roja me de têgeha herî pir tê bikaranîn. Lê ev têgeh, herî kêm tê nasîn û têgeha ku di nava tarîtiyeke pir mezin de maye. Di derbarê nasîna dewletê, nezanbûneke mezin heye.

Ji bo ku dîrok bê nasîn, pirsgirêkên roja me werin çareserkirin û rewşa civakê ya alozî were derbaskirin, pêwîst e dewlet baş were nasîn û nirxandin. Lewra, nasîna dewletê girîng e.

Ya herî asteng, ew e ku kesên xwe ji dewletê dihesibînin, nizanin amûra ku lê siwarbûne, cureya wê çiye, girêdayî vê, kesên ku ji derveyî dewletê mane jî wisa ne. Ji ber ku dewletê baş nas nakin, ev rewş weke guftûgoya di navbera ker û koran de ye.




Dema Kelha Babilê ya ku hefîye, du civakên ku bi zimanên cuda diaxivîn li ser keda wê tên avakirin û ev rewş bi dewletê re bûye yek, weke ku ji hemû pirsgirêkan xelasbûye tê dîtin. Dewlet, bi piranî weke qada çareserkirina pirsgirêkan tê dîtin.

Gaveke din pêşdetir, dewlet di asta xweda de tê pejirandin.

Dewlet, di wateyeke teng de, weke berhemên pirtir û aboriya yekdestî e ku li ser nirxan hatiye avakirin. Dewlet ji bo berhemên pirtir û nirxên civakê ji civakê bidize, xwe bi amûrên bîrdozî û zorê li ser civakê birêxistin û yekdest dike. Ger em li gorî vê, li wateya teng a dewletê binêrîn, dewlet bi ramyariya ku weke hunera rêveberiyê ya ku xwe bi awayekî kor li ser nirx û berhemên pirtir, bi rêxistin dike.

Dema ku li kûrahiya wê ya civaknasî were nerîn, di dirêjiya dîroka şaristaniyê de pêşketina ku çêbûye, tê dîtin ku xwedabûn û dewletbûn ketine nava hev.



Piştgiriya rahîban a ji dewletê re, sedema herî girîng e ku xwedabûn û dewletbûn ketine nava hevde. Dema ku rahîb, dewletê çêdikin, bi taybetî, di nasnameya perestgehê ya sumeran de xweda weke endamekîbîrdozî serpoşiya bîrdozî ya ramyarî tê bikaranîn.

Rahîb, gavekê di pêş de ye. Qral, qralxweda ye. Ev rewş, ta roja îro hatiye, ev qralxwedayê ku bingehê xwe ji perestgehên sumeran digire, jê re têgeha imparator jî hatiye bikaranîn.

Weke ku ji rastiya wê tê têgihiştin, dewlet amûreke, mîna cinawiran e ku ji xwîn û dagirkeriyê têr nabe.

Dewlet, hebûneke ku hemû şaneyên wê bi xwînê tên tîmarkirin. Em ê di gelek mînakan de bibînin ku cinawir, ew kesên ku xwe weke xwedayan dibînin, van hebûnên herî binirx tune dikin û dikin qurban. Her wiha, hemû bermahiyên sincî yên civakê bin pê û tune dikin.

Sultanekî Osmanî, di bin navê ewlehiya dewletê de di şevekê de, hevde (17) birayên xwe dixeniqîne. Di hemû dîroka Roma û Persan de dewletê bi darê zorê û bi hejmareke bêdawî, hovîtî pêk aniye. Ev hemû, xebatên xerab dibîne û çanda xenîmet û talanê bilind dike. Ji bo ku van hemû tiştan bi gel bidin pejirandin, têgeha xweda ferman dike, xeyalên buhişt û dojeha sexte di mejiyê mirovan de çêdike ta digihîje xana dagirkeran û sultanê mezin, qeyser û şah weke imperator rakirine asta xweda. Ev

xwîna ku bi hezarên salan dilop bi dilop hatiye rijandin. Ev hemû di bin navê van mezinên ku cewherê wan tune ye de hatine pêkanîn.

## Di Dewletbûyînê de Sazûmankirina Maf (Hiqûq)



Ji ber ku dewletê dest daniye ser hilberîna zêde û pê dijî, di cewherê xwe de wekhevî yan jî, bimafî (hiqûqî) nabe. Lê, ji ber pêwîstiya avakirina rêzikan ji bo endamên xwe û welatiyên xwe, li gorî zagonên ji berê de hatine diyarkirin û wekhev, tevdigere, ji rêzik û zagonan re, "dewleta bimaf (hiqûqî)" tê gotin.

Tê zanîn ku sinc, yekbûna diyardeyên pir zindî, nerm, hilberîner û pîrozkirî ye. Lê belê, zagon xwediyê taybetiyên cemidî, ferman dide, ji derve de dide heskirin lî pîvanan bi zorê dide pejirandin.

Ramyarî, hunereke azadiyê ye. Dewlet, di wateya klasîk de, ne rêvebirina karên civakê ye. Ji bo vê danasîna ramyariyê bi civakê bide pejirandin, wê danasîna dewletê jî, bi desthilatdariyê re weke diyardeyekê cihê xwe bigire.

Ji ber ku dewlet amûreke desthilatdariyê ye, her dem heyîna xwe bi rêxistin kiriye, bi zorê daye meşandin û dibe xwediyê pêkanîna zagonên hişk.  Çawa ku dewleta demokratîk çênabe, mafê demokratîk jî, gelekî derbas nabe.

Li hemberî civakê, dewletê weke alternatîfekê di navendên bajaran de bingehê xwe daye çêkirin. Di nava civakê de xwe weke civakeke jor daye ferzkirin. Li hemberî çanda civakê, desthilatdariya xwe, li hemberî sincê civakê jî, mafê xwe pêşxistiye.

## Pirsên Nirxandinê

**1-** Dewlet û ramyariyê, pênase bikin.
**2-** Çawa dewlet ji bo berhemên zêde û nirxên civakê, xwe birêxistin dike?
**3-** Di dîrokê de li şûna qiralxweda de, çi têgeh hatine bikaranîn?
**4-** Çima bi dewleta bimaf, pergala demokratîk çênabe?

# BEŞA ÇAREM: DI CIVAKA KURDAN DE ÇAND Û SINC

- Êl û sincê kurdan
- Zerdeştî û sincê azadiyê
- Çand û sincê Ezdayetiyê
- Pêvajoyên pişaftina çandê
- Elewîtî û çanda Kurdan a berxwedêr
- Di qonaxa Îslamiyetê de rewşa bawerî û çanda Elewîtiyê
- Di pergala kapîtalîzmê de pişaftin
- Çanda berxwedan û xiyanetê

**Wane 1**

# ÊL Û SINCÊ KURDAN

Yek ji taybetiyên kurdan, ew e ku mayîna xwe di çêkereke êlî de parastine.



Çanda hevbeş a civaka kurd, derketiye derveyî komên êlî. Erdnîgariya Mezopotamyayê û gelên wê pir zû derbasî zayendperestî û civaka çînî bûne. Kurdan jî, demeke pir dirêj li ber xwe dane. Sedema vê, jiyana kurdan a li cihên kaş, kendal û li wan cihên ku dijmin nikare bigihîje wan, li wan deran jiyane û li gorî xwe ew der baş dîtine. Girêdana xwînê ji ber ku ji civakên din baştir dibînin, biguman nêzîkî têkiliyên çînayetî nabin. Bêguman, ne di cudahiya wê dene, ji ber awayê civaka çînî ne pejirandine û li hemberî civaka çînî li berxwedane. Ango asta êlî derbas nekirine.

Çanda êlî hîn jî di nava kurdan de bi hêz e. Dema ev tê gotin, nayê wê wateyêdiyar nake ku di roja me de têkiliyên êlî di nava civakê de rast in. Her wiha, dîrok hatiye demeke wisa ku dema êlî li hemberî civaka çînayetî, di rewşa herî azadî xwaz de, helwest nîşan dida, zayendperestî û desthilatdariya çînî çiqas pêşket, çêkera êlî her ku çû bi cewherê xwe re hat beramberî hev û hêza sîxurî û xiyanetê, zayendperestî û desthilatdarên zayendperest di nava xwe de hewandin.

Çêkera sincî ya civaka kurd, berxwedêr, azadî xwaz û xwedî taybetiyên jiyaneke hevbeş e. Dema ku çand û sinc nehevbeş bin, jixwe nabe ku mirov dabaşa civakeke bisinc jî bike.

Di dîrokê de kurd, weke gelê xwedî sincekî baş hatine nasîn û zanîn. Ev ji Hûriyan destpê dike, bi Medan bilind dibe û di etnîsîteya kurdan de digihîje nasnameyekê.

Mirovên kurd ên mêrxas, merd, durist, bidad û rast, têgehên sincê baş diyar dikin, hemû gelên ku bi kurdan re ketine nava têkiliyan, pesnê başiya sincê kurdan kirine.

Her gelê ku di dîrokê de bi kurdan re bûye cîran, jiyaye yan jî yên ku bi pirsgirêkên wan bi hêzên dijmin û dewlwetê re hene bi kurdan re jiyaye pirsgirêk, hêzên dijmin û dewletê bûye heyranê sincê mirovî yê civaka kurd bûneû hertim pesnê kurdan dane.

## Pirsên nirxandinê


- Çand û sincê êlên derdora xwe, lêkolîn bikin

**Wane 2**

# ZERDEŞTÎ Û SINCÊ AZADIYÊ

Di dijbertiya pergala şaristaniyê de cihekî taybet ê bîrdoziya zerdeştiyê heye. Ronahî, zelalbûn, çand û sincê wî yê bi heybet ê pergala Zagrosê ye. Li hemberî serdestiya bîrdoziya şaristaniyê, dixwest bi berxwedana civaka sincî bersivê bide û li hemberî derewan, rastiyê bide diyarkirin. Her ku bi bingehê çanda Rojhilata Navîn a hevbeş be jî, lê li hemberî îslamiyet û xiristiyaniyê xwe nû nekir. Tevgera Zerdeşt ku derketina wê 1000'î B.Z dest pê kiriye, ji resenta xwe bêhtir, weke reformekê pêş ket. Mirov dikare bêje ku kevneşopiya Ahuramazda (di baweriya zeredeştî de xwedawendê aliyê başiyê ye) reformkir. Ahuramazda, baweriya aryenan a herî kevnar e. yezdanê aryenan, ê hevbeş e.






Dema ku êrîşa aşûriyan dest pêkir, bi baweriyeke mezin pêwîstî bi reformbûnê dîtin. Pêşketina sinc, bi rastiyê ve têkildar e. Jiyana rast, di zerdeştiyê de rêgez e. Dema ku rewş wiha be, pêwîstî bi bîrdoziyeke sincî heye. Tevneke vê bîrdoziyê ya cuda heye.

Tarî û ronahî, başî û xerabî, rastî û şaşî û hwd. bêguman taybetiyeke wî ya dualîzmê heye.

Herwiha, baweriya zerdeştiyê afirandineke diyalektîkê ava dike. Bi awayekî diyalektîkî dîrokê gotûbêj dike. Bandora vê baweriyê li her sê olên pîroz (cihûtî, xiristiyanî û îslamê) jî heye.

Ola Budîzmê jî, bi baweriya zerdeştiyê bandor bûye. Her çiqas baweriya zerdeştiyê di sedsala 7'an B.Z de be jî, lê bêhtir weke sembola rahîbê Magan, hevbeş hatiye dîtin. Bêguman dibe ku rahîbekî bibandor ê Magan be jî.

Di hin pirtûk û lêkolînên ku li ser dîroka kurdan hatine kirin de diyar dikin ku Zerdeşt bi misogerî ji malbateke Medî ye.

Wateya Mag, bi kurdî, ji pêtên agir ên di tifikê de civiyayî re tê gotin.

Tê gotin ku jiyana Rahîbê Magan bi giştî di şkeftên Zagrosê de derbas bûye. Ji ber ku Zagros sare, hertim ji bo xwe agir kirine û li derdora agir gotûbêj kirine. Ji ber wê jî, ji wan re dibêjin "Rahîbên Magî".

Ew dizanin ku jiyaneke bê agir, ne gengaz e. Ew li Bakurê Rojavayê Îranê jiyane.

## Rêgezên Zerdeşt ên ji bo Jiyana Civakî:

- Kargeriyeke bi rûmet dide têkiliyên hevsengiya nava zayendan
- Di nava hevjînan de, ji têkiliyên hiyerarşîk bêtir, rûmetê dide têkiliyên wekhev û azad.
- Ji têkiliyên koledarî hez nake
- Di zerdeştiyê de derew, bê sinciya herî mezin e
- Di zerdeştiyê de aborî, li ser çandinî û xwedîkirina lawiran e
- Dema ku debara xwe dike, xwezayê diparêze. Parastina xwezayê, ji rêgezên wî yên herî bingehîn e
- Serjêkirina lawiran û xwarina goşt, baş nabîne, ji wan sûd girtinê bêhtir dipejirîne
- Karê çandiniyê, karê herî pîroz dibîne. Ev baweriya, ola Medan e

Her çiqasî xirîstiyanî û islamiyetê çavkaniya xwe ji ola zerdeştiyê girtibin jî, lê ji bo ku ola xwe serdest bikin.

Baweriya zerdeştiyê ziyana herî mezin ji fetha îslamiyetê dîtiye. Mazdek, Xûrem, Babek formên zerdeştiyê yên herî dawî ne. Mirov dikare bêje ku, weke serhildana zerdeştiyê ya dawî ne. Her sê form jî li hemberî sasanî û ebasiyan bi berxwedaniya xwe bûne sembola qehremaniyê.

Li ser bingehê sincê, dijberiya pergala şaristaniyê dike, di jiyana civakî de kesayeteke demokratîk pêwîst e.

Baweriya zerdeştiyê, ji bo ola yekxwedayî jî weke çavkaniyekê ye, Incîl, Quran û Tewrat jî di serî de, ji ola zerdeştiyê bingeh girtine.



Mirovên Ola Zerdeştiyê

Her ku xwestibin navê ola zerdeştiyê winda bikin jî, lê zerdeştî winda nebûye, xwe di nava van olan de daye berdewamkirin.

Mînak: Di hemû olan de derew, dizî, xerabî û hwd, weke nebaşiyan tên dîtin . Ev rêgez, rêgezên zerdeştiyê ne. Gelek rêgezên van olan, rêgezên ola zerdeştiyê ne.

### Felsefeya Zerdeştiyê li ser van pîvanan ava dibe.

- Baş bihizire
- Xweş biaxive
- Rast pêk bîne

## Pirsên Nirxandinê

1- Di zerdeştiyê de taybetiya dualîzmê şîrove bikin.
2- Pîrozbahiya agir li cem magan, ji kû hatiye? Şîrove bikin.
3- Ola zerdeştiyê çawa nêzîkî xwezayê dibe?
4- Desthelatdarên xirîstiyanî û islamê bi çi awayî çûne ser ola zerdeştiyê?

**Wane 3**

# ÇANDA Û SINCÊ EZDAYETIYÊ



Wetaya peyva Êzdî: Ezda (ez-da) te wateya yê ku ez dame, yê ku ez afirandim e. Di heman demê de peyva ku di heman wateyê de xwedêda jî tê bikaranîn. Peyva xwedêda di roja me de di nav êzîdiyan de tê bikaranîn. Ezda navekî xwedê ye û ev di nav êzîdiyan de tê pejirandin.

Di zimanê zazakî (dimilkî) de Mazda (maz-da) yê ku em dane = xwedêda

Di zimanê kurmancî de xweda (xwe-de) = xwedêda

Di ezdayetiyê de, yê ku em dane, di ezdayetiyê de navê xwedê yên dine

Di êzayetiyê de yek ji navên xwedê yê herî mezin "xweda"ye.

"Êzdî, Ezda, Ezd, xweda, yezdan, padşa, meda" ji hezar navên xwedê çend navin. Li gorî lêkolîn û zanista heyî mirov dikare bibêje ku bingeha ezdayetiyê pir kevnar e.

# Ezdayetî:

Li gorî lêkolînên ku hatine kirin gelê êzidî gelekî pir kevnar e. Di dîrokê de gelek stem û komkujî li wan hatine serê wan. Ji bo ku dîroka çand û sincê xwe biparêzin li hemberî stem û zordariyê li ber xwe dane, piraniya wan jî belavî welatên cuda cuda bûne û li wan deveran çand û baweriyên xwe parastine. Gelê êzidî li başûrê Kûrdistanê, rojavayê Kurdistanê, bakurê Kurdistanê, Ermenîstan, Gûrcistan, Ukranya, Rusya û gelek deverên din delav bûne.

Ezdayetî kevne, ev çand di bîr û baweriya wan û di rêûresmên wan yên rojane de diyar dibe. Ji ber piraniya van rêûrismên ku niha pê radibîn vedigerin beriya hezarên salan. Ev rêûresim li cem gelên Mezopotamyayê bûne weke rêzikname.

Êzidî di gelek qonaxên dijwar re derbas bûne, di encama van qonaxên dijwar de ji ber peydabûna bîr, bawerî û olên cur bi cur hinek guherîn bi bîr û baweriya êzidiyan re çêbûne, lê belê tevî hemû zor û zehmetiyan, êzidiyan reseniya ol û baweriya xwe parastine.

Di demên pir kevn de, êzidî di peyda bûna erd, asîman, roj, heyv, av, ax û heyinên din yên xwezayî de hizirîne.



Her olek taybetiyên wê yên felsefî û mîtolojî hene. Êzidî jî hizir, bîr û baweriyên wan ên taybet hene. Hin rêûresmên êzidiyan di hin ayinên din de hene û berovajî vê hin rêûrismên êzidiyan hene di ayinên din de tune ne. Lewma cudahî di navbera bîr û baweriyan de tiştekî bingehîne. Êzidî bi rêûresmên xwe, bi qewil, malik, helbest û dîwanên xwe binav û dengin. Ev hemû derbirîna ola ezdayetiyê dikin. Baweriyeke êzidiyan ya mezin bi rêûresmên wan heye, ji ber vê yekê heya niha parastina bîr û baweriyên xwe dikin û her wiha bi rêzdarî nêzî ol û baweriyên din dibin.

## Çanda êzidiyan di milê cejnan de:

Cejna Serêsalê bi gelek navên din jî tê naskirin. Weke: cejna Tawisî Melek, Melke Zeyîn, Çarşema Sor û Kiloça Serêsalê. Weke hatî xwiya kirin êzidiyên başûr, bakur û rojavayê Kurdistanê her sal di Çarşema yekê ji meha Nîsanê (li gorî salnameya rojê, ku bi 13 roja piştî salnameya jidayîkbûna Îsa ye) de pîroz dikin. Weke ku ji navê wê xwiya dibe, ew pîrozkirina sala nû û tazeye. Herwisa ev cejn li gel Sumerî û Babiliya jî heye, tê de pêşwaziya sala nû dikirin û digotinê "Ekîto" ango bi zimanê Babilî Serê salê û di meha gulanê decli cem wan zewaca Xudawendê wan "Temuz" bû.

Gulan, weke hinek lêkolînvan û zimannas dibêjin, ji "Nûsal" hatiye ango despêka sala nû. Bêguman ev cejna herî mezin e û li gorî rewşa êzidiyan e.



### Li gorî sincê ezdayetiyê, xalên ku mirov xwe jê biparêze:

1. Fesadî û bêbextî.
2. Zinê.
3. Kuştin.
4. Riba.

5. Derew û destdirêjî.



## pîroziya Laleşê:

Laleş ji demên kevn de cihê kombûna mirovên xwedênas bû. Gelek mirovên ji ol û baweriyên cuda li vir bi cih bûne û hatine Laleşê. Şêx Hadî tevlî alîgir û hevrêyên xwe li Laleşê mabû û gelek ji wan di gelîyên pîroz de hatine veşartin. Sindrûka Şêx Hadî di bin quba mezin ya perestgehê deye û cihê serdana bawermendên ezdezdayetiyê ye. Tevayî kesên serî li Laleşê didin (hecî) xêra xwe dibin perestgehê. mîna: zeyt, nan, pez, dewar û gelek tiştên wisa, ji bo ku xizmetkarên Laleşê wan bi kar bînin. Her êvar li perestgehê fitîl û çirayên bi zeyta zeytûnan tên vêxistin, lê belê êvara çarşem û înê berî roj biçe ava li ber her nîşangeheke pîroz çira tên gur kirin. Laleş cihê tewafa êzidiyan e, her sal meha



îlonê rêûresim tên çekirin. Di van rêûresman de qurban tên serjêkirin, bi lêxistina defan rêûresmên xwe yên olî bi cih tînin û îlahiyan dixwînin.

## Di roja me de gelê êzidî-Şengal

Di 3'yê têbaxa 2014'an de terorîstên daîşê êrîşî gelê êzidî ên Şengalê kirin. Hem di nava bajarê şengalê de û him jî li derdora bajar pir komkojiyên mezin pêk anîn. Ev êrîş bû sedama fermaneke mezin. Ev ferman, fermana 73'an e ku li ser gelê êzdî pêk hatine. Çeteyên daîşê bi vê fermanê dixwest dîrok, çand, bawerî û sincê civaka gelê êzidî ji holê rakin. Ev hêza êrîşkar ji bilî kuştina mirovan, êrîşî nirx, çand û cihên dîrokî kirin. Di encama van êrîşên hovane de bi sed hazaran gelê êzidî, bajar û gûndên xwe berdan. Li hemberî van êrîşan hêzên parastina gel

HPG ketin şengalê û li hemberî daîşê şerekî dijwar dane meşandin. Di encama tekoşîna ku hat kirin de, pir deverên di destên çetyên daîşê de hatin rizgarkirin. Bi sedan mirov ji destê daîş hatin rizgarkirin. Piştî demekê û bi şûnde hêzên parastinê yên Şengal hatin avakirin. Li ser bingaha parastina gelê Şengalê, Şengal di 13'yê mijdara 2015'an de ji destên çeteyên daîş'ê hat rizgarkirin.

## Pirsên Nirxandinê

1- Wetaya peyva ezdayetiyê lêkolîn bikin û encamên wan diyarbikin.
2- Sedamên ku hiştine gelê êzidî koçberî welatên din dikin çine? Lekolîn bikin
3- Çarşema sor çiyê ji aliyê kijan gelî ve tê pîrozkirin, grîngiya wê çiye?
4- Li gorî sincê êzdayetiyê xalên ku mirov xwe jê biparêze çine, rêzbikin.
5- Lêkolînekê di derbarê şengalê de bikin û encamên lêkolînên xwe di refê de bi parve bikin.

Wane 4

# ELEWÎTÎ Û ÇANDA KURDAN A BERXWEDÊR



Elewîtî, hebûna xwe di nava kevneşopiyên ramyarî, bîrdozî û felsefî yên ku koka çanda Rojhilata Navîn de ava kiriye, hatiye. Pêwîste ku Elewîtî weke baweriyeke ku di nava wê de nirxên demokratîk ên xwezayî, jiyana komînal, azadî û wekheviya herêma Rojhilata Navîn digire nava xwe, were nasîn. Elewî, yek ji wan civakan e ku bi wan nirxan bêtir dagirtî ne.

Mirov dikare bêje ku elewîtî bi qasî ku bawerî ye, ew qas jî çandeke. Ji bo vê taybetiya wê, elewîtî tenê weke ol, felsefeyek ango tenê weke mezhebekî girtine dest.



Elewîtiyê hemû tiştên ku hatine gotin, li gorî rastiya xwe û pêwîstiyên berdewamiya xwe parçeyek ji civakan girtiye.

Bi wê taybetiya xwe, elewîtî yek ji nûnerên van civakên bindest ên ku kokên xwe dispêrin dîrokê.

Ger bê gotin mezhebek e, ev jî wê aliyekî elewîtiyê bi lêv bike. Ji ber ku şêweyê baweriya elewîtiyê ji îslamê pir cudatire û di nava xwe de, di her mijarê de pergaleke wê heye.

Elewîtî, di bingeh de ji pirsên weke: civak çawa dijî? Çi dihizire? Nêzîkatiya wê ji xweza, mirov, bûyer, jin û desthilatdariyê re çi ye? Nêzîkatiya wê ji demokrasî û azadiyê re çi ye? Li bersivan digere.

Di encama wan bersivan de hişmendiyek û şêweyê jiyaneke giştî afirandine û girtine destê xwe. Ev têgeh, ji bo danasîna Elewîtiyê, nêzîkatiya herî rast e. Di Elewîtiyê de bi kevneşopî û bermahiyên olên kevn re girêdan pir xurt e. Bi taybetî jî, bi kevneşopiya ola zerdeştiyê re, têkiliya Elewîtî bi îslamê re bi rêya Ehlil-beyt, ango malbata pêxember re çêbûye.
Piştî mirina pêxember, bêmafiya ku li malbat û xizmên pêxember hatiye kirin, Elewîtiyê ev bêmafî weke zordarî dîtiye û xwe bi vê daye ravekirin.

Nakokiyên ku di ola îslamê de hatine jiyîn, Elewîtî Ehl-elbeyt nêzîkî xwe dîtiye, lewma di Elewîtiyê de hezkirina Hz. Elî û kurên wî Hesen û Huseyn pir e.

Di heman demê de, Elewîtiyê xwestiye ku xwe bi pejirandina Hz. Elî ji êrîşên îslamê yên leşkerî û bîrdozî biparêze.

## Pirsên Nirxandinê

**1-** Taybetiyên Elewîtiyê weke baweriyekê, çi ne?

**2-** Elewîtiyê, di bingehê xwe de çi pirs rave kirine?

**3-** Di dîrokê de kengî zordarî û bêmafî li elewîtiyê hatine kirin?

**Wane 5**

# DI QONAXA ÎSLAMÊ DE REWŞA BAWERÎ Û ÇANDA ELEWÎTIYÊ

Elewîtî, li hemberî êrîşên desthilatdarên Îslamê li ber xwe didin û bi vî awayî erdnîgariya çiyayan ji xwe re bingeh digirin.

Elewîtî, ji bilî ku çêbûneke olî ye, aliyê wê yê berxwedanê jî heye. Baweriya ku herî kêm bi îslama fermî bandor bûye, elewîtî ye. Di aliyê civakî de jî ew beşa civakê ku ji derveyî emewîtiyê maye, elewîtî bi xwe ye. Elewî, her tim ji aliyê pergala şaristaniya dewletperest ve bi perçiqandinê re rûbirû mane. Di qonaxa îslamê de êrîşên perçiqandina elewiyan bêhtir bûn.

Hz. Huseyn ku ji malbata Ehl-elbeyt bû û 72 kesên ku li gel wî bûn, li Kerbelayê anîn komployekê û ew kuştin. Elewiyan, nikarîbûn vê qirkirinê bipejirînin û ta roja me ya îro, ji bo bîranîna wan şînê dikişînin.

Elewîtî, di nava îslamê de xwedî li cewherê wê yê sincî û ramyarî derketiye.

Di nava îslamê de her tim xwestiye ku nêzîkatiyeke dadî, wekhevî û azadî bi cih bike û ji bo ku vê herdemî bike, weke tevgereke civakî xwedî taybetiyekê ye.

Îslamiyet, dema ku weke hêzeke ramyarî di destê Emewiyan de vegeriyaye çeka stemkar û zordariyê, Elewî perçiqandine û bi çewisandineke pir cidî re derbas kirine.

Vê rewşê, di pêvajoya ebasiyan de jî berdewam kiriye. Di dema destpêkê de ebasiyên ku xwe weke hêzeke nêzî Ehl-elbeyt dane diyarkirin, karibûn mirovan bixapînin.

Pêkanînên mandele û tunekirinên ku li ser elewiyan hatine meşandin, di pêvajoya osmaniyan de jî hîn bêtir, bi pergal û bi şêwazê ramyariyên kuştin û zordariyê berdewam kiriye. Elewîtî, ji aliyê dewleta osmaniyan ve, weke baweriyeke jirêderketî, hatiye dîtin Ji bo ku nûnerên wê werin kuştin ji aliyê şêxan ve, gelek caran fetwa hatine

dayîn û di navbera baweriyan de dijminatî hatiye pêşxistin. Elewiyên ku weke gawir hatine destnîşankirin û ji bo ku ji ser rûyê erdê werin paqijkirin, weke fermaneke şerîetê bi civakê re dane pejirandin û li her cihî derketine nêçîra elewiyan.
Di pêvajoya osmaniyan de li ser elewiyan ev planên kuştin û zordariyê ku hatine meşandin, di elewiyan de rê ji şkandinên pir kûr re, vekiriye, beşeke diyar jî kişandiye nava dewletê. Vî beşê hevkar, ji aliyê dewletê ve ramyariya qirêj ku li ser civakê hatiye meşandin, risteke pir bibandor lîstiye.

Piştî hilweşîna osmaniyan, Tirkiyeya Kemalîst di bin navê modernîzmê de, li Kurdistanê li ser Elewiyan zordariyeke mezin meşandiye.

Kurdên elewî yên Dêrsimê di salên 1937-1938'an de bi destê dewleta Tirk hatin kuştin. Piştî vê komkujiyê, kurdên vê herêmê bi komkujiya çandî re rûbirû man. Di asteke jor de hem elewîtî, hem jî nasnameya wan a netewî pir lewaz bû.

## Têkiliya di navbera Elewîtî û Şîetiyê de:

Têkiliya elewîtî û şîetiyê tenê di hezkirina Ehl-Elbeyt de ye. Gelek kes Elewîtî û Şîetiyê weke hev didin zanîn. Ev nasîneke şaş e.

Di roja me ya îro de, destpêkê di nava kurdan de û her wiha di nava tirk û ereban de Elewîtî weke bawerî û çandekê tê jiyîn.

# Pirsên Nirxandinê

.

**1-** Têkiliya desthilatdarên îslamê bi elewîtiyê re çawa bû?

**2-** Elewîtiyê li gorî cewherê xwe yê sincî û ramyarî, çi xwestiye di nava îslamê de bike?

**3-** Cudahiya di navbera Elewîtî û Şîetiyê de çi ye?

**4-** Osmaniyan di salên 1937-1938'an de, çi bi kurdên elewî yên Dêrsimê kirine?

**Wane 6**

# PÊVAJOYÊN PIŞAFTINA ÇANDÎ

## Di Pergala Hiyerarşî (çînî) û Dewletparêz de Pişaftin:

Berya ku Mezopotamya pergala xwe ya xwedî dewleta koledar a destpêkê bijiya, bi demeke pir dirêj derbasî vê pergalê nebûbû û bi awayekî xwezayî bi rêya klanê jiyana xwe berdewam dikir.

Pergala hiyerarşî û zayendperest, bi çînî û pergala mêtinger her çiqas di bingehê hin civakan de hatibe jiyîn jî, nikare sincê civakê yê hevbeş, serûbin bike. Di pêvajoya pêş a dîrokê de, di civaka kurd de beşeke kêm xwestiye derbasî pergala bidewlet bibe, çanda çînî ya ku rahîbên Sumeran afirandiye, dixwestin bi zorê, van pergalan bi kurdan bidin pejirandin.

Di dîrokê de weke çanda samîtîk jî tê nasîn, çanda nêçîrvanî û şivantiyê ku ji vê bilindtir, bi zayendperestiyeke hişk û bi çînayetiyê hewl dane ku çanda çîna desthilatdar a pergala bidewlet û koledar. belav bike.

Kurdan tam di nava van civakên bi dewleta kole re rawestîneke nîşan dane, lê dema aliyên pêşketinê li gorî pêşketina pergala bidewlet rast negirt, çanda dewleta koledar, xwest gelên ku azad dijiyan talan û dagir bike û her ku dixwaze li wê derê, weke xwe, di çanda zayendperest û dewleta çînî de pêş bixe.



Di vê demê de pişaftina çandî li ser kurdan disepînin. Di destpêka çanda desthilatdar a pir lewaz de, bi dewleta koledar a Aşûr re gihîştiye nasnameyekê, her cihê ku dagir dikir, çanda xwe ya koletiyê li ser wan ferz dikir. Di dema imperatoriya koledar a aşûriyan de cudahiya pir hişk

a bi awayê kole û efendî, pêş xistine. Çanda bîrdoziya desthilatdar û bi zorê pişaftina çandî jî di kurdan de dane pêşxistin.

Aşûriyan çanda koletiyê belav kirine. Di Babilê de dewletbûn, di Misirê de çanda hiyerarşiyê weke çanda şaristaniyê belav bûye. Ji gelê kurd, her dem hatiye xwestin ku bi van pergalan re bibe yek û bingehekê ji bo çanda zayendperestî û çanda çînayetiyê ava bike. Lewra di kurdan de pişaftin her ku diçû berfirehtir belav dibû.

Rahîbên Sumeran, bi taybe pişaftin bi şêweyekî dîrokî, di hêla birêvebirinê de, bêhempa dane bidestxistin.

Pişaftina çandî, qada bîrdozî, ramyarî û leşkerî dorpêç dike. Bi taybetî, rêbazên pişaftina bîrdozî, hîn jî ji hêla pergalên desthilatdar ve yek ji rêbazên ku herî pir tê bikaranîn.



Di şerê Enkî û Înana de û di tekiliya Gilgamiş û Enkîdo de şerê desthilatdarî û hewldana pişaftinê gelekî diyar e. Çawa Hûmbaba bi zorê bin ketibe û Enkîdo bi rêbazê bîrdozî hatibin helandin, di kesayeta wan de jî, gelê kurd hatiye kuştin û helandin.

Di civaka kurd de yên ku herî bi pişaftinan re rûbirû mane, ew kurdên ku di cihên rast û deştan de dijiyan, cudakirina efendî û kole pir hêsan bû û di demeke kurt de gihîştiye armanca xwe.

Ev çand, di Rahîbên Sumeran de çandeke resen e, lê di kurdan de tu carî çandeke wiha resen pêş neketiye. Çanda Sargon a desthilatdar resen e û çanda dewleta Babil jî, resen e. Lê, di nava kurdan de tu caran çanda desthilatdariya çînayetiya resen çênebûye. Ji ber ku bingehê vê çandê, di civaka kurd de pir bi pêş neketiye.

Tevî ku hemû ramanên li dijî çanda kurd a resen dixwestin, bi xwestek an jî bi zorê pişaftinê li ser kurdan pêk bînin. Hewl didan ku kurdan bixin nava pergaleke bidewlet. Lê gelek dewlet bi vê pergala xwe ya koledar

hatine paqijkirin, an heliyane, yan jî bi zorê neçarî razîkirina pergala xwe kirine. Civaka kurd di pêvajoya dewleta koledar de, her çiqasî hin taybetiyên xwe winda kiribin jî, berxwedaneke girîng jî li hemberî pergala dewletê kiriye.

## Pirsên Nirxandinê

1- Çanda çînî ya ku rahîbên Sumeran afirandiye, dixwestin li ser kurdan çi bidin pejirandin.
2- Çanda desthilatdar, bi dewleta koledar a aşûriyan re gihîştiye kîjan nasnameyê?

**Wane 7**

# DI PERGALA KAPÎTALÎZMÊ DE PIŞAFTIN

Bi belavbûna dema sermayedariyê û awagirtina "dewleta neteweyî"re pêvajoya pişaftinê ya li ser ziman û çanda kurdî dijwartir dibe, her wiha zordestiya ereb, tirk û persan jî bêtir bûye.

Di serdema civaka xwezayî de û piştre jî çand û zimanê kurdî yê di nava etnîsîteyê de hebûna xwe parastiye, lê piştre bi pêşketina teknîk û zanistê re çand û zimanê serdest, weke çand û zimanê fermî, zimanê kurdî pir pelixandin û pişaftiye.

Çand û zimanê kurdî ku di serdema navîn de gelek berhemên wêjeyî didan der, di bin givaştina ramyarî de her ku diçû, teng dibû. Kurdayetî weke çand û ziman xistin rewşeke biguman û kirin mijara guneh û gunehkariyê. Bi çalakiya herî dijwar a gunehkariya bûrjûwaziyê re rû bi rû hiştin. Pirsgirêkên ku têkiliyên xwe bi rastiya kurd re hebûn, di taybetiya gunehên xeter de hatin hesibandin. Her sê netew-dewlet jî, tirk, pers û ereb ji çand û zimanê dewletê wêdetir, li ser tevahiya hebûnan pişaftin, dûrxistin û pevajoyeke bi çand û zimanê serdest bi dijwarî, dan meşandin.



Perwerdekirina bi zimanê dayîkê û yê kurdî jî tê de hemû dibistanên perwerdeyê, hatin qedexekirin. Lê yên ku derfetên wan hebûna, dikarîbûn di dibistanên neteweyên serdest ên nûjen de hîn bibin.

Kurd û kurdayetî di her qadê de li derveyî nûjeniyê, hatin hiştin. Çêkirina pirtûk, rojname û sirûdên herî asayî yên kurdî, weke "kurdîtî" hat hesibandin û di çarçoveya guneh û qedexeyan de hat hesibandin, lê ereb, tirk û persan bi nijadperestiya xwe, pergala sermayedariyê, hişyar-kirin e.




Her çiqas gelê kurd, di dîrokê de gelê herî kevn û afirîner bû, di roja me de bi rewşeke ku nehatiye dîtin re rû bi rû maye. Di dîrokê de dergûşî û dayîktî ji şaristaniyê re kiriye, lê bê şaristanî maye. Weke gelekî bibe qurban û piştre jî, bi xiyaneta herî xerab, ji mafên mirovan ên bingehîn bêpar bimîne, lê weke koma mirovên herî biseza were destnîşankirin, divê ji xizmeta her kesî re amade be, lê ji rewşeke bilanet xilas nebe. Dê bibe weke mirovên hemdem, lê ji nirxên dîrokê para xwe negire. Weke gelên nûjen yên reş, zer yan jî çermsor hêjayî koletiyê jî nayê dîtin. Kurd tên mandêlkirin, lê zimanê wan ê herêmî ê ku li ser lingan maye jî mafê bilêvkirineke azad nanase. Di serdema sermayedariyê de pirsgirêka me ya herî mezin, ew e ku pêwîst e were sererastkirin.

Pergala bidewlet a sermayedar, ger ji bo gelên din pêvajoyeke xizmetê be, lê ji bo kurdan pêvajoya mirinê ye. Di pergala dewleta koledar de ji kurdan re civaka çînî hat ferzkirin, lê weke tê zanîn tu caran li ser civaka xwe nebûne desthilatdar û weke: Asûr, Babil, an jî Roma nehatine asta imperatoriyekê. Di pergala sermayedar de ji nasnemeya xwe ya neteweyî, ji zimanê xwe û çanda xwe di cewher de destjixweberdan hat ferzkirin.

Çima li ser kurdan, pêkanîna ramyariyeke wiha pêwîstî pê hatiye dîtin û pêşxistin? Gelek sedem tên nîşankirin, lê sedemên herî diyar erdnîgariya Kurdistanê, gelê kurd ê xwedî dîrok û şaristaniya herî kevn ku li hemberî çanda şaristaniyê her tim dijberî kiriye, ji çanda berxwedêr re malovanî kiriye. Pergal ji ber vê yekê her tim dijmintiya kurdan dike, û mandêl dike.

## Rêbazên Pişaftinê:

Bi taybetî, di roja me ya îro de ji bo pişaftin û qirkirina çandî ya civaka kurd rêbaz, şêwaz û ramyariyên cur bi cur tên meşandin û pêkanîn. Di pergala kapîtalîzmê ya ku teknîka bê sînor pêşxistiye de, di roja me de bi rêya tv, internet rêzefîlm, dibistanên dewletê yên şofînî û hwd. qirkirina çandî tê meşandin.



**Mînak:** Weke dibistanên taybet ên hin kesan, hem bi rêya xerab bikaranîna ol û hem jî di aliyê ziman de li ser ciwanan û civakê bandorê dike û balê dikişîne ser xwe.

Her wiha, bi çanda rojane ku bi hestên ciwanan ên paşketî dilîze, pergala desthilatdar bi taybetî ciwan û zarokan dikişîne aliyê xwe. Ji xwe weke me di waneyên xwe yên berê de jî dît, ên ku di nava civakê de herî zêde xwedî paqijî, zarok û ciwanên wê civakê ne. Ji ber vê yekê, ev kesên civakê ji bo pergala zordar, weke pariyekî amade ne, ku bixwin. Ji bo vê jî, hêzên deshilatdar û mêtinger, bi taybetî li ser ciwanên Kurd dilîzin, dixwazin wan ji rastiya gel û neteweya wan, her wiha tekoşîna azadiyê dûr bixin, di jiyaneke sexte, xeyalî û biyanî de bipişêvin.

Weke encam, gel û ciwanên me divê li ser vê baldar bin û ji bo jiyîna çand û sincê xwe di nava têkoşîn û parastinê de bin.

## Pirsên Nirxandinê

1- Di roja me ya îro de ji bo helandin û qirkirina çandî ya civaka kurd, çi rêbaz tên meşandin?
2- Bandora kapîtalîzmê ya li ser civaka kurd lêkolîn bikin.

**Wane 8**

# ÇANDA BERXWEDAN Û XIYANETÊ

Destkeftiyên gelê kurd ên dîrokî, encama çanda berxwedan û azadiyê ye. Ked, kêrhatin, serborî û jiyana azad a bi hezarên salan çanda civaka kurd e.

Dîroka çalakiya berxwedanê ku çandeke gelan e, ta pêvajoyên derketina civakbûna destpêkê diçe.

Li hemberî her cure desthilatdariyê, weke desthilatdariya çînparêz û ta desthilatdariya ol û netewedewletê jî, her tim berxwedana gel a di tevgerê de bi rêgezên xwe, li ser erdnîgariya ku gelê kurd tê de dijî, pêk hatiye.

Bêguman kurdan serkêşiyeke bibandor bi awayekî neçarî girtiye ser xwe. Li hemberî pergala desthilatdar, kurdan bi qasî ku karîne, li gorî hêza xwe têkoşîn dane.

Dijmin, li hemberî vê kevneşopiya berxwedanê ya azadîxwaz, hewl dane ku kurdan ji hundir ve bişikînin û bingehê azadiya wan bê wate bikin.

Daxwaza azadiyê ya kurdan ji hûriyên pêşnimûne, ta gûtî û medan weke civak, li hemberî pergala desthilatdar risteke girîng lîstiye.

Hûrî û medan ji bo azadiya xwe li hemberî desthilatdariya asûr û babilan çi kirine û çawa şer dane meşandin? Ji bo gelên tên perçiqandin, risteke pêşengî ya dîrokî lîstine. Lê di civaka feodal û sermayedar de bi taybetî çîna kurdan a jor, ji azadî û berxwedanê zêdetir, radestbûn pejirandiye. Bi vî awayî, cihêkariya çînî ya di civakê de pêk tê, lê cudahiyeke wisa çêdibe ku çîna jor a kurdan pirî caran ji bo welatê xwe, xaka xwe û civaka xwe nebûne xwedî çandeke ku xwedî lê derkevin.

Bi vî awayî, yekîtiya civakê zoriyeke ji dil, jiyaye. Her çi qas derfetên hevgirtina yekîtiyeke hevbeş a di navbera hêzên civakî, çînî û di nava gel de jî hebe, bingehê mercên civakî ji aliyê van hêzan ve her tim hewldana xerakirina wan hatiye dayîn.

Bi taybetî, piştî xiyaneta Harpagos a ji dema medan û pê ve, her ku çûye xiyanet di nava çîna jor a kurdan de pêş ketiye.

Desthilatdarên kurdan rista koletiyeke bê rûmet lîstine. Li şûna ku bi dijminên xwe re şer bikin, bi erkê sîxurî, nokerî û hevkariyê, gelê xwe perçiqandin û bûne rêberê ramyariya mandêlkirin û tunekirina xwe û gelê xwe. Xwe anîne rewşeke ku êdî ji çanda xwe, zimanê xwe û nasnameya xwe şerm bikin.

Bi taybet, di pergala sermayedariya hemdem de, ji hevkariyê wêdetir, li ser bingehê xwemandêlkirinê, xwe ew qas biçûk kirin, bi qasî ku gelê kurd tevahî tune bikin.

Dîroka kurdan, bi qasî dîroka berxwedan û azadiyê ye, di heman demê de dîrokeke bi xiyanet e jî. Komên xwediyê vê çanda xiyanetê, bi piranî bi bandora hêzên derve çêbûne û kesên pir vala, bê vîn, statûya wan a civakî nayê pejirandin in û weke komekê ku bi zorê hatiye gel hev vê çîna desthilatdar, tevahiya kombûnên gelê kurd ên mirovahî, ji bo berjewendiyên xwe firotine dijmin û firotineke wiha ji xwe re kirine pîşe.

Civak çi qas pêşket, bi awayekî xwezayî statûyên civakî jî neçar in ku werin guhertin. Lê ev guhertin, di kurdan de weke guherîneke xwezayî pêk nehatiye. Çêkera êlî ya kurdan di ristlîstina di hêla civakî de li gorî dema borî bêhtir ber bi paş ve awa girtiye. Gelek tiştên ku Kurdan winda kirine, hene. Nasname, çand û zimanê kes û civakê bi xwe ye, bi awayekî azad xwe bilêvkirin e.

Kurdan çêkera çînî pir pêk neanîne, nebûne dewlet, lê her tim xwestine bibin civakeke azad. Ji bo azadiyê, her tim bi mirinê re rû bi rû mane. Ji bo azadiyê jî, pêwîstî bi çanda berxwedanê heye.

Ger îro hebûna kurdan tê giftûgo kirin, ev rewşeke hizirînê ye. Pişaftin, tiştekî xerab e, lê ger li welatekî xiyaneta hundirîn pêş bikeve, ev rewşeke bi nîqaş e. Di sedsala dawî de, kurd ketine pêvajoya xwe ya dîrokî ya herî bi tirs. Êdî kurd, xwepişaftinê dijîn. Eger wiha berdewam bike, gengaz e ku di pêvajoya nêzîk de êdî netew, wê nasnameya xwe winda bike. Ji bo rawestandina vê xeta xiyanetê, gelê kurd rêya berxwedanê pejirand û ev berpirsyariya dîrokî hilgirt ser milên xwe.

Îro jî gelê kurd ne bi tena xwe bi hemû gelên din yên li rojhilat û bakûrê Suriyeyê dijîn berxwedaneke bê hempa li hemberî çeteyan dikin û welatê xwe bi hev re diparêzin.

Ev yekbûna gelan li ser bingehekî demokrat hatiye pilankirin û hemû gelan soza parestina hev dane û bi vê sozê vejînekê ava dikin.

## Pirsên Nirxandinê

1- Di civaka feodal û sermayedar de bi taybetî çîna kurdan a jor, çi bandor li ser kurdan kiriye?

2- Desthilatdarên kurdan, li şûna ku bi dijminên xwe re şer bikin, çi rist lîstine?

3- Di dîrokê de helwestên gelê kurd ên li hemberî pergalên desthilatdar, çi bûn?

4- Tevî ku kurdan çêkera çînî pir pêk neanîne û nebûne dewlet, çi xwestine?

# Belavkirina Waneyan Li Ser Sala Xwendinê

| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | ÇAND Û SİNCÊ KURDAN | ÇAND Û SİNCÊ SURYANAN |
| Cotmeh | ÇAND Û SİNCÊ EREBAN | ÇAND Û SİNCÊ ERMENAN | ENCAMÊN KU ÇAND DERDIXE HOLÊ | DI ÇANDÊ DE HUNER |
| Mijdar | CIVAKÎBÛN Û SINC | DI CIVAKÊ DE RISTA SINCÎ | TÊKILIYA SINCÎ BI BAWERIYÊ RE | SINCÊ AZADIYÊ |
| Berfanbar | DI DEMA PALEOLÎTÎKÊ DE ÇAND Û SINC | DI DEMA PALEOLÎTÎK DE ŞÊWAZÊ JIYAN, ÇAND Û SINCÊ CIVAKÊ | DI DEMA NEOLÎTÎKÊ DE ÇAND Û SINC | AVABÛNA PERGALA JIN-DAYÎKÊ |
| Rêbendan | Lêveger | Nirxandin | Bêhinvedan | Bêhinvedan |
| Reşemeh | AVABÛNA PERGALA JIN-DAYÎKÊ | ÇAND Û SINC DI ÇÎNAYETIYÊ DE | ÇAND Û SINC DI DEWLETÊ DE | ÊL Û SINCÊ KURDAN |
| Avdar | ÊL Û SINCÊ KURDAN | ZERDEŞTÎ Û SINCÊ AZADIYÊ | ÇANDA Û SINCÊ EZDAYETIYÊ | ELEWÎTÎ Û ÇANDA KURDAN A BERXWEDÊR |
| Cotan | DI QONAXA ÎSLAMIYETÊ DE REWŞA BAWERÎ Û ÇANDA ELEWÎTIYÊ | PÊVAJOYÊN PIŞAFTINA ÇANDÎ | DI PERGALA KAPÎTALÎZMÊ DE PIŞAFTIN | ÇANDA BERXWEDAN Û XIYANETÊ |
| Gulan | Lêveger | Nirxandin | | |